

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliya navîn

# bîrnebûn

[www.birnebun.com](http://www.birnebun.com)

Havîn û Payiza 2000an

**Koma Kurdên Anatoliyê,**  
**Bîrnebûn û rola wê**  
Redaksiyona kovarê

**Yunak Kürtleri**  
Kenan û Muzaffer

**Bedelê kên**

Nuh Ates

**Bi dergîstîbûna Guldil**  
Yusuf Yeşilöz

**Çarîn ji hêlê Sarizê-2**  
M. Bayrak

**Terk Etmedi Sevdan Bizi”**  
Lütfü Karacadağ

**Sessislikten Gelen Ses”**  
Mustafa Selimoğlu

**Metelog**

M. Ş. Dağ

**Zivingê-3**

Musa Anter

**Kiyneki w tencî**  
Neçirvan Qilorî

**Aksaray Dîmîlicesi**  
Memê Hilkecikî



# bîrnebûn

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.  
Sé mehan carê derdikeve/Üç ayda bir çıkar.  
Havîn û payiza 2000an

Utgas av Apec-Förlag AB  
Ans. utgivare  
Ali Çiftçi

Redaksiyon  
Ali Çiftçi, Bekir Darı, Dr. Mikaili, Haci Erdogan,  
Mehmet Bayrak, M. Duran, Muzaffer Özgür,  
Nuh Ateş, Sefoye Asê, Vahit Duran

Adress / Navîşana li Swède  
Box: 3318, SE 163 03 Spånga / Sverige  
Telefon: 0046-(0)8-761 81 18  
Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-post  
info@birnebun.com

Internet  
www.birnebun.com

Navîşana li Almanyayê:  
M. Özgür/Birnebûn  
Postfach 900348, 51113 KÖLN/Almanya  
Telefaks: 0049-(0)2203-301630

Bîha/Fiyati:  
Europa: 10 DM Türkiye: 1 milyon TL

Abone (2 yıllık bedeli):  
Isveç: 400 SEK - Almanya: 80 DM

Türkiye banka hesap numarası:  
F. Yıldız Vakıf Bank Polatlı Şubesi  
Hesap No: 00158001 445398272.

Isveç hesap numarası:  
(Birnebûn) postgiro: 468 65 12-7

Almanya hesap numarası: M. Özgür  
Stichwort "Birnebûn" Deutsche Bank-Köln  
Konto Nr: 5912662 BLZ: 37070060

Belavkirin / Dagitim  
Türkiye  
Toplum Kitabevi / Remzi İnanç  
Bayındır sok. 22/1, 0642 Yenişehir / Ankara  
Tel: 0312/434 25 43

Medya Kitapevi / Selahattin Bulut  
İstiklal Caddesi, Elhamra Pasajı No: 258/6  
Beyoğlu-İstanbul

Gül Kitapevi  
Lise cad. Zafer karşısı No 23/a / Kırşehir

Hollanda  
Neçîrvan Qilori  
Postbus 419' 3300 AK Dordrecht / Nederland  
Tel: 0031-62 4663655  
Gironummer: 739 81 58

Danmark  
Dansk-Kurdiska Kulturhuset  
Nansensgade 32 ST, TN 1366 København K.  
Danmark

Çap / Baskı  
Apec-Tryck AB

ISSN 1402-7488

Her nivîskar berpirsiyarê nivisa xwe ye. Mafe  
redaksiyonê heye ku nivîsen ji Birnebûne re têñ,  
serrast û kurt bike. Nivîseren ku ji Birnebûne re  
têñ, ger çap nebin jî li xwedî nayêñ vegeandin.

Wêneya berg: Hesê Çûçê ji Omera  
Ji arşîva Mem Xelikan



## Naverok/ îçindekiler

### 3 JÎ BÎRNEBÛNÊ

Ali Çiftçi

### 5 HESÊ ÇÛÇÊ

### 6 NAMEYÊN JI XWENDEVANAN

### 10 DUYEMİN CIVÎNA GIŞTÎ YA SALANE YA BÎRNEBÛNÊ

Vahid Duran

### 12 TOPLANTIDAN İZLENİMLERİM:

Mem Xelikan

### 13 KOMA KURDÊN ANATOLIYÊ, BÎRNEBÛN Ü ROLA WÊ

Nuh Ateş

### 19 HASAN HARMANCI (HESÊ MALÊ ELÊ)

Yusuf Polat

### 22 YUNAK KÜRTLƏRİ

Kenan û Muzaffer

### 28 BEDELÊ KÊN

Nuh Ateş

### 34 DIYA MIN Û MIRINA BAVÊ MIN

Musa Anter

### 39 ÇARİN JI HÊLÊ SARIZ È - 2

Berhevkar: Mehmet Bayrak

### 44 BI DERGİSTİBÛNA GULDIL

Yusuf Yeşilöz

### 46 «SESSİZLİKTEM GELEN SES»

Mustafa Selimoğlu

### 49 BIZE GÖRE, BIZE UYGUN, YANI BİZİM .....

Raporaj: Vahit Duran

### 55 HACER TEYZE

### 60 LIHEVHATIN Û XURT KIRIN

Rebenî Celika

### 63 SWÊDÎ Û KURD

Karin Levander

### 67 METELOK

Berhevkar: Temeli Bayrak / M. Ş. Dağ

### 72 «TERK ETMEDİ SEVDAN BENİ»

Lütfü Karacadağ

### 75 KARTLAR, BEYAZITLAR, ÇAMLIBELLER VE DUMANLAR

Rohat Alakom

### 82 KIYNEKİ W TE'NCÎ

Arêkerdox: Nêçîrvan Qilori

### 84 AKSARAY DİMİLICESI (Dimilice-Türkçe sözlük)

Hazırlayan: Memê Hilkeçiki

## Ji Bîrnebûnê

Xwendevanên birêz, ev hejmara bi derengî ket. Ez li ser navê redaksiyonê ji we, xwendevanên dilovan lêborînê dixwazim, ji ber ku sebeba bi derengî ket hinek jî, ji ber karên min yên şexsî bû. Ev hejmar divê di havînê de derketa. Ji ber ku dereng ma, me ev hejmar wek hejmara havîn û payizê bi nav kir.

Ji me ra heta niha pir namên xwendevanan hatine. Hûn ê hinek ji wan naman di vê hejmarê de jî bibînin. Ditin, rexne, pêşniyar, serbilindî û kêfxweşî di hemû name û telefonên ku ji me ra têne de hene. Rexneyên ku têne kirin; bi destxistina kovarê, naveroka nivîsan û tekiliyên kovarê bi xwendevana re ne. Em wek redaksiyona kovarê van hemû dîtinan di cih de dibinin û pê kêfxweş in ku insanên me dixwazin hin tiştên berbiçav û baş bêñ kirin. Ji ber wê jî di civîna Birnebûnê ya giştî ya îsal de ji bo ku karê kovarê hin baş û bi rêkûpêk bê meşandin li ser avakirina weqifekê bîryar hat stendin. Em di wê baweriyê de ne, ku ev karê kovarê divê bi profesyoneli bêt meşandin. Karên kolektifi, dema imkan jê ra neyên peyda kirin piştî demekê nameşe. Fedekarî di destpêka her karî de pêwîst e. Bê fedekarî ti kar bi ser nakevin. Lê dema ew fedekariya dûr û dirêj berdewam ke û jê ra imkan peyda nebin ku derbasî profesyonaliyê be, dê xwe bi xwe dawiya karê xwe bîne. Ji ber vê yekê jî avakirina weqfê dê karê me ber bi profesyonali bibe û em ê bi hev ra di daxwazên xwe yên ji bo pêşerojê de bi serkevin.

Di vê hejmarê de hûn ê disa nameyên xwendevanan bixwînin. Vahid Duran bi navê *Duyemîn civîna giştî ya salane ya Bîrnebûnê*, li ser civîna giştî ya îsal ku li

bajarê Kôlnê di 27-28ê Gulanê çêbûbû bi ferehî sekiniye. Nivîsa xwe bi çend wêneyên ji civînê ve xemilandiye. Hesê Çûcê yek ji van mezinên me bû ku di wexta xwe de bilûrvanekî şareze bû. Tiştê ku bo me pir balkêş e ev e; ku di sala 1960î de di radyoya TRTê ya Tirkîyê de klasikên ji aliyê me kasetek amade kiriye. Hesê Çûcê ji çavkaniya Heme Zer, Mem Xelikan di wê hejmarê de daye nasandin. Ji bo min jî balkêşiyek ev bû; dema Mem Xelikan wêneyên Hesê Çûcê ji min re şand, hevalê ku wêne da min, ne dizanî ku ev kesê li kîleka Hesê Çûcê kî ye. Min dit ku ev bavê min e.

Bi navê *Koma kurdên Anatoliyê û Bîrnebûn û rola wê*, gotara ku di civîna giştî ya îsal de li ser navê redaksiyonê hat xwendin hûn ê ji qelema Nuh Atêş bixwînin.

Hasan Harmancı (Hesê malê Elê) yek ji wan kurdên Anatoliya Navîn bû ku di nav xebata siyasî ya kurd de wek insanekî zana, kurdperwer û humanist hem li welat û hem jî li Almanyayê dihat naskirin. Mixabin di demeka zû ji nav me bar kir û çû ser heqîya xwe. Em li vir li ser navê redeksiyona kovarê ji malbata Hesen re dibên; serê we sax be. Xwedê sebrekê bi we de, Hesen ê her di dilê me de bijî. Yusuf Polat li ser jiyana Hesen bi navê *Hasan Harmancî (Hesê malê Elê)* dûrûdirêj bi kurdî nivîsiye.

Disa di quncika bi navê Yörelerimizi tanyâlim de li ser kurdên Yunaxê bi tirkî, Kenan û Muzaffer bi navê *Yunak Kurtleri* nivisek balkêş û informatif bi nexşa Yunaxê amade kirin. Destêwan sax û qelema wan xurt be. Nuh Ateş bi navê *Bedelê Kêñ* hekateke bi zarava reşuya nivîsiye, hûn ê bi kêfxweşî bixwînin.

Zivingê-3 bi sernivîsa *Diya min û mirina bavê min* bîranînên Musa Anter bi wergera kurdî berdewam e. M. Bayrak bi sernivîsa Çarîn ji hêla Sarizê-2 kilamên folklorik yên vê heremê berhev kiriye.

Mustafa Selimoğlu bi navê "Sessizlikten Gelen Ses" nivisek bi tirkî, li ser berhemên Yusuf Yeşilöz ku bi zimanê Almanî derketine nivisiye. Birêz Mustefa li ser niqteyeka baş û gîring sekiniye û herwiha naveroka berhemên Yusuf Yeşilöz bi kurtî daye.

Yusuf Yeşilöz bi navê *Bi dergîstibûna Guldil* serpêhatiyek nivisiye, bi hêviya ku hûn dê bi kêfxweşî bixwinin.

Vahît Duran bi berpirsê komela sporê, Hemoyê Celiki re roportajek bi tirkî kiriye. Tiştên Hemoyê Celika dibêje, divê li ser bît sekinandin. Em ji komela sporê û Hemoyê Celika re serkeftinê dixwazin.

Nivisek bi navê *Swêdî û kurd, rasthatinên bi sedsalan* ji aliyê rojnemevana swêdî, Karin Lewander ve bi wergera

Seyîdxan Anter bi kurdî heye. Karin Lewander li ser kitêba Rohat Alakom (ku bi swêdî, di destpêka sala îsal de bi swêdî derketibû) diseleine û gîringiya *pêwendiyêñ swêdî û kurdan di nav hezar salî* de bi naveroka kitêbê dide naskirin.

Disa metelokên ji navçeya Anatoliyê ji aliyê Temeli Bayrak û M. Ş. Dağ ve hatine berhevkirin. Lütfü Karacadağ bi navê "Terk etmedi sevdan beni" li ser Ahmed Arif û şîrîn wî bi tirkî nivisiye.

Lêkolîner Rohat Alakom li ser çar malbatên kurd û têkiliyê wan, bi navê *Kartlar, Beyazitlar, Çamlibeller ve Dumanlar* bi tirkî lêkolinek balkêş bi wêne amade kiriye. Nêçîrvan Qîlôri bi sernivîsa *Kiyneki w Tencî* bi dimili çirokeke li aliyê Aksarayê nivisiye.

Memê Hilkeçikî bi Ferhenga Hilkeçikî (Dimulice-Türkçe Sözlük) ev hejmara dewlemend kiriye.

Bimînin di xêr û xweşiyê de.

*Ali Çiftçi*

## Değerli okurlarımız,

Bîrnebûn ilk sayısından bu güne deðin yoğun bir okuyucu tepkisi ile karşı karşıya kaldı. Bir iki istisna hariç tepkilerin hemen hepsi olumlu ve yayın tarzımızı doğru bulan, destekleyen içerikte oldu. Bu bizleri son derece mutlu ederken ne kadar anlamlı bir uğraþ verdiğimizde ayırdına her defasında yeniden varmaya vesile oluyor.

Bizlere gelen mektup, faks, e-mail gibi iletileri elden geldiðince okuyucu mektupları kösesinde yayníyoruz. Bunda amacımız, okur kitlemizin duygularını ve düşüncelerini, dağıldığı alanları gözler önüne sererken bu mütevazi tepkiyi teþvik etmektir. Bununla birlikte bu sevindirici olayı sizlerle paylaşmak istememizdir.

Ne varki sizlerden bir iki ricamız olacak. Gelen iletilderde bazen bizlerin de doğru bulduğu öneriler var. Okuyucumuz bizlerle ilişkî kurmadığından öneriler havada kâliyor. Bu durumda bir değişiklikte olmuyor (Örnek ODTÜ'den gelen mektup). Diğer yanda hemen her iletide bazı yazılarının olduğunu bahs eden okuyucu bu yazılarını bir türlü zahmet edip bizlere göndermiyor. Birde, bizleri sürekli öven sözlere teþekkürler ama yerine bölgesinden bir *ağit, hikâye, atasözleri* vs. derlenip gönderilse aslında daha çok sevinecegiz. Ama biz yine de iletilerinizi beklediðimizi belirtelim.

*Redaksiyon*

# Hesê Çûçê

(1915-1990)



**J**i Kuluyê ji gundê Tavşançalî (Omeranlı) yê ye. Navê wî yê resmî Hasan Mercan e. Di 1915an de li gundê Tavşançalîyê ji dayik buye. Di 1942an de ji ber daweyeke araziyê ceza lê hat bîrrîn û li hepisxaneya Zonguldakê raza. Li hepisxaneyê li dezgehên "kaput bezi" kar kiriye. Piştî ku ji hepisxaneyê derkdikeve wan dezgehan tîne gundê Omeranlıyê û dest bi vî karî dike. Piştî demekê dîsa vedigere karê bavûkalan; cotkarîyê. Wexta ku li ser xermanan kar dike destê wî dikeve ber patozê, seqet dimîne.

Bilûrvanê herî bi nav û deng ê herêmê bû. Her çendî seqet ma ji lê dîsa jî dev ji bilûra xwe ber neda. Bi destê xwe yê jêbûyî dîsa jî xwes li bilûrê dixist.

Di 1960an de ji bo TRTyê [Dezgeha Radyo û Televîzyona Turkiyeyê] ji klasîkên herêma me (*Qamışê Qul, Ema Hemê* u hwd.) kasetek amade kir.

Di 1990î de wefat kir.

Çavkanî: Heme Zer  
Foto: Ji arşîva Mem Xelikan

## Ji Birnebûnê re!

Ez bawer im, dawiya meha gulanê li Almanyayê Birnebûnê hinek civîn saz kirin. Berî ku civîn pêk bén, min xwest ku derheqê wan civînan de hinek agahiyan dest bixim. Ku me jî, ji vir fîkr û daxwazên xwe diyar bikirana. Lê, mixabin ew daxwaza min pêk nehat.

Diyar e ku ev kêmeziyeke me ye. Divê têkilî û pêwendiyêñ me -di navbera yên Ewrupa û yên li vir- hin xurttir bin. Ez bawer im, ew kêmeşî jî di civînan de hate niqaş kirin.

Niha, em li hêviya encamên civîna ne. Jixwe hunê wan biryareñ ku hatine girtin, di hejmara bê de eşkere bikin. Ji bo pêşerojê ci lazim e ku bête kirin? Ji bo wan ci tevdîr û xebat divêñ? Ji bili wana, bawer im, li ser pirsgirêka belavkirina kovarê, pîrsa ziman (Emê zimanekî çawa û li gorî kîjan pîvanan bikarbînin?), karê redaksiyonê û kémbûna kesên pîspor di vî warî de, li Turkiye û li welêt tiştêñ ku bikaribe bête kirin di pêşerojê de hate rawestan.

Min jî naçzane fîkr û xeyaleke min hebû. Hêvi dikir ku ew jî bibe mijareke wan civînan. Ew jî, vekirina saziyeke çandî ji aliyê kurdêñ Anatoliya Navîn ve. Ev hêviyeke min e. Derfet û îmkanêñ me têri vê yekê dîkin an nakin ez bi dorfirehî nizanim. Ancax, li vir hewcedariya sazî û platformeke wisa heye. (Ji bo vê yekê jî bajarêñ me, ya herî mimkûn, bi dîtina min Enqere ye.)

Ez bawer im ji aliyê we ve jî kifş û diyar e, ku kovar kêrî hinek tiştan jî

nayê. Lazim e ku, xwendevan platformeke li ser çand, ziman û hunera xwe bibîne. Di saziyeke bi vî rengî de xebatêñ li ser perwerdehiya ziman, li ser muzîka kurdî, li ser zargotina kurdî, li ser edebiyat û hunera kurdî dikare bête kirin.

Ü bi vî awayî karê li ser milê yên Ewrupa jî siviktir bibe. Kovareke hîn baş û hîn pêşketitir jî derkeve holê.

Tiştêñ din jî dikare bê gotin, lê bawer im, ew raman bes in ku hun û xwendevan li ser vê yekê jî hinek biramin û serî xwe pê biêşînin.

Bi hêviya jiyanekе ronitîr,  
silav û hurmet!

## Mistefayê Eşxanê

## Bîrnebûnciyêñ Delal!

Gava ku di hejmara nehan a Bîrnebûnê de, ez pêrgî karikatura berga paşîn hatim, coş û heyecaneke bêhempa dil û hinavê min wergirt! Ev ci bi hostayî hatibû diyar kirin! Fîkr û ew ziman ci bi hostayî hatibû diyar kirin! Min hîç berhemeke bi vî rengî û bi vî nirxî nedîtibû!

Em ji birêz Bekir Dari re çiqas spas bikin, bawer bikin kêm e! Hezar carî spas ku birêz B. Dari em ji hunera xwe ya bi rûmet bêpar nehiştine!!!

Birêz B. Dari bawer bike te bi zimanê xwe jî, em hînî zimanê kurdî kirin! Ev zimanê xwesik û rewan, ev fîkr, bi ya min zûtirîn katê de dest bi romannivîsinê jî bike! Welleh tê bika-

ribî ji qehirînê Mehmed Uzun û Helîm Yûsiv ji bikuji!

Di nav hunera xwe de dîtin û “mesaj”ên di cî de ji diyar dike, ji bo xwendevanê mîna min i reben! Bi karikatureke bedew rîya rastin şanî me dide ku, emê çawa bibin miyekê spi!

Ger ez dev ji henek û menekan berdim û bi kurtî fîkr û daxwaza xwe eşkere bikim, ezê van gotinan bêjîm:

Berêz B. Dari tika û rica dikim (bi wê ji namînim li ber te diqerim), ji niha û pê ve, bi roket an mekîkeke NASA yê bige Marsê û li wir bi mîzah û karîkaturê mijûl be! (Ez bawerim tu yê min bibexşînî! Ez berx û miya te! Ketime tor û bextê te!)

#### \* Miyek Belek

De bêje ka miya belek ci bike? Li gorî rexneyên te yên hêja, miyên belek dê çawa tevbigerin!

#### Mistefayê Eşxanê

#### Silav ji hemû Xebatkarên Bîrnebûnê re!

Ez kurdê Anatolya Navîn im û li Sivîsrê (İsviçrê) dijim. Hemû hevalên li Sivîsreyê dijîn dikanin Bîrnebûnê ji hejmara 2an hetanî hejmara 11an ji min bixwazin. Ez dikarim bi postê ji we re bişinîm.

Serkeftin bo me hemîya ne.

Bi xatire we.

#### Hamit / Sivîsre

#### Silav û hurmet ji redaksiyona “Bîrnebûnê”ra

Hejmaren kovara we ketin destê min. Ez pê gelek kîfxwaş bûm. Di kovara we da pir malumatên hêja û

giranbiha hebûn. Ez bawerim ku hinek ji wan miqalan wê kîrhatî bin ji bona lêkolînê derheq folklor, êtnologîaê, dîrok û zimanê kurdi. Destê we xwes.

Prof. Dr. Celîle Celîl

#### Xebatkarên bîrnebûnê ra serkeftin dixwazim

Hemû hejmarên wê dilê me hemûyan xwes kirîye. Ez ji Kurdeki Anatolya Navîn ji gundê Kelhesen im. Di derbarê xebatê we de ji we ra carekê din serkeftin dixwazim. Bimînin di xêr û xweşiyê de.

#### Nûro Canbegî /Sivîsre

#### Silavên germ ji we ra !

Di karekî de destpêk, tiştikî pir giran e, we xurt destpêkir. Lê pewist e, ku hûn vî karê xwe sirf pêş da bin. Tiştêk ez dixwazim bibêjim ev e: Dîrok tiştikî pir giran e. Lê pêşeroj li wê girantir e. Ez mecbûr im dîroka xwe nas bikim, ji ber ku ez bikarim jîyana xwe rast çêbikim. Çand li nav me pir kêm e û ji ber vê yekê ji, iro em li gora demê pir kevn mane. Pêwist e, êdî em tiştên nû çêbikin.

Şiir, klam, roman, govend va tiştana mecbûr em pêşve bin. Dinê tu car li hêz nekirîyê û me ji tim gotiye “ba pez û naxirê me hewin, ew bes e.” İro em dibînîn Kurdêن me hatine Ewrupê û niha ji li vir dibêjin; “ba perê me hewin tiştê din ferq nakin.” Erê, farq nake, wexta sibê gedêne te rabûn saygî nedan te û bûnî hîppî, zatêne ferq nake!...

Eger îro tiştek bi me lazime, xwendina zarokan e. Ji ber tunebûnê we nexwend, lê îro imkan hene,bihêlin ba zariyê we bixwînîn. Li Ewrûpê imkan pir in. Bermedin! Ba zaryê we jîyana xwe bi tiştên nerind re xirav nekin.

Zarokên xwe bi xwendin bidin. Di jiyanê de pêş bikevin.

Li qûsirê min mesmekin, min serê we êşand. Silavêr germî ji we ra rê dikim.

Rojên baş, tim yên we bin.

Nûrî

Ez Kurdeki Konya- Yunakê me. Ez we piroz dikim û serkeftinê dixwazim.

Muhammed Agit

Avusralyadan Selamlar !

Rojbaş Havalooooo !!!

Bizler, Avustralya'dan İç Anadolulu bir kurt aile olarak derginize abone olmak istiyoruz. Amacımız hem derginize katkı sunmak hem de kendi gerçekliğimizi tanımak istememizdir. Derginin satış ücretini ve posta masraflarını bize bildirirseniz memnun oluruz.

Emine ve Zafer /Avustralya

Değerli arkadaşlar !

Mayıs ayında Köln şehrinde genel bir toplantı yaptığınızı öğrenmiş bulunuyorum. İzine gelen bir yakın akrabam katılmış. O anlattı biraz. Toplantının gayet olumlu geçtiğini ve bir vakıf kurma kararının alındığını söyledi. Dergiyle bu akrabam sayesinde

tanışmama karşın ilk sayınızdan beri okuyor takip ediyorum. Beğendiğimi ve mutlu olduğumu belirtmemek gerek yok.

Ben kararı alınan vakıfla ilişkili bir iki şey söylemek istiyorum. Oldukça zor, ama insanlarınızın şu anki konumuna son derece uygun bir oluşum vakıf. Bu fikri gündeme getirmeniz ve öncülük etmenizi saygıya değer bir olay olarak görüyorum. Orta Anadolu Kurtleri olarak realitemiz, sosyal konumumuz böylesi bir vakıfın ilgi alanı için çok uygun. Vakıf bir an önce kurulmalıdır. İlk üyelerden birisi olacağımı şimdiden deklare ederim. Gerek maddi gerekse manevi desteğim sizlerle olacaktır. Vakıf görevleri ve ilgileneceği alanlar üzerine somut önerilerim olacak onu da bir dahaki mektubuma bırakırken en içten selamlarımı iletiyorum.

Miçî mala Mihe/Ankara

Ben bütün Kurt halkına selamlarımı gönderiyorum ve Bîrnebûn çalışanlarına başarılar diliyorum.

Fevzi Demir/ Frankfurt

Ger derfetên we hebin di Medya Tv' de ji mehekê carekê hin programan li ser Kurdên Anatoliya navîn çêkin, bi muzîk, bi tlf., bi sohbetan hwd!

Hesen Gündogan

Sevgili Bîrnebûn redaksiyonu ! İlk sayınızın üzerinden üç yılın geçtiğini öğrenmiş bulunuyorum. İlk sayınız henüz yeni elime geçti. Bir

arkadaşım bir kaç sayınızı verdi. İçerik ve tarz olarak çok beğendiğimi söylemeliyim. Özellikle yayınladığınız tarihi belgeler konusunda sizleri kutlamak istiyorum.

Bir konuda sizleri eleştirmeme izin verin. Derginizi bulmak Karun hazineğini bulmaktan daha zor. Orta Anadolu Kürtlerinin yoğun yaşadığı Kopenhag'da yaşıyor olmama rağmen derginizle -daha doğrusu dergimizle- üç yıl sonra tanıştım. Ülkede yaşayanlar bu zorlukları nasıl aşıyor acaba ?

Dergimizin gelişimi ve güçlenmesi için her türlü yardıma hazırlım. Bazı yazılarım var sizlere göndereceğim. Çalışmalarınızda başarılar dilerim. Saygılarımla.

Rebenî Celika/ Kopenhag

Merhaba, Sevgili bîrnebûn redaksiyonu çalışanları,  
Sizlere yazmak ve sizlerle kucaklaşmak istedim. Dergiyi Türkiye'den takip edebiliyorum. Ankara'daki satış büronuzdan dergiyi alıyorum. Okuyor ve çevremdeki bazı arkadaşlara bahsediyorum.

Sizleri biraz eleştirmek istiyorum. İnternet sayfanız iyi değil. Bu konuya daha fazla itina göstermeniz mümkün değil mi? Bir de derginin içeriğine ilişkin bazı eksikliklere değinmek istiyorum fakat olanaklarınızı iyi bilmediğim için fazla birşeylerin söylenmesini de doğru bulmuyorum.

Bölgemizde halk arasında kabul görmüş, halka mal olmuş insanlarımız, yaşlılarımız var. Neden onlarla röportajlar yaparak tarihsel ve kültürel

değerlerimizi belgelemiyoruz ? Neden yörenizde akademik yapı içerisinde olan insanlara gidilmiyor ? Bir önerim var. Derginin bir sayısının yayınlanmasını durdurun ve bu parayla bölgede Sosyolojik çalışma yapan bir araştırmacuya finans kaynağı yaratın. Bu çalışma çok yaralı olur kansıdayım. Bölgede çalışma yapacak her araştırmacı için insanların kucak açacak, onu sahipleneyeceklerdir. Buda işlerin kolaylığını sağlayacaktır. Sevgi ve selamlar.

ODTÜ'den bir okuyucu  
Ankara

Merhaba Dostlar !

Her internet sayfaniza uğradığında halen "Hazırlık aşamasında" yazıyor. Ya! Ne zaman bitecek bu hazırlık aşaması? Orta Anadolu Kürtlerinin sanal bir dünya üzerinde ortak bir yerlerinin olması çok güzel olacak ama biraz çabuk ya! Çok aceleciyim biliyorum. Fakat bir an önce arkadaşlara tavsiye etmek istiyorum. Özellikle Kürdistanlı arkadaşlara. Çünkü onlar Orta Anadolu Kürtlerini tam olarak tanımiyorlar. Bize ait bir sitenin olduğuna inanmak istemiyorlar. Neyse bizde böylelikle kendi içimizden kadar güçlü bir bağ olduğunu, hiç bir zaman kendi kimliğini inkar etmeyecek güçte bir kişilik kazanımının olduğunu gösterebileceğiz. Bu yüzden çok mutluyum. Biraz acele etmenizi istiyorum.

Sevgiler saygılar.

Oğuz Berk  
Viyana

# Duyemîn civîna giştî ya salane ya Bîrnebûnê

Vahit Duran

vahit@birnebun.com



Duyemîn civîna giştî ya salane ya Bîrnebûnê di navbera 27-28 ê Gulanê de, dîsa li Elmanyayê, li bajarê Kölñê hate lidarxistin. Aleqedariya ji bo vê civîn a ku wê her sal were çêkirin, weke par dîsa zêde bû.

Beşdar, ji bili iştisnakekî, hemû ji Kurdên Anatoliya Navîn, ên li welatên cur bi cur ên Ewrupa belawbûyî pêk hat. Vê carê Mem Xelikan ê ku bi helbest û nivîsên xwe piştgirîkeke mezin daye kovarê, ji welêt hat û tevlî civînê bû (Ev bûyer a ku beşdar êxistin nava hestêن cur bi cur de, bi dilxweşî hate pêşwazi kirin. Em di wê baweriyê de ne ku hunê dîtinêن Mem Xalikan ên di derbarê civînê de bi balkêşîyek e mezin bixwînin).

Redaksiyona Bîrnebûnê ji bo baş derbasbûna civînê pêşhaziriyyêن berfereh çêkiribûn. Di despêkê de kesen ku di derbarê bi giştî civak a

herêmê serên xwe êşandî, ên di kovarê de nivîsa dinivîsînin, şexsiyetêن ku kovarê bela dîkin hatin vexwandin. Vexwandêr bi terzeke ku em hîn nebûyî beşdarî civînê bûn. Kesen nekarîn beşdar bibin jî, mazuretêن xwe bi awayek nivîskî û devkî ragihandin.

Civîn ji ber ku di dawiya heftiyê de hate lidarxistin, du rojan berdewam kir. Sala derbasbûyî ci ji cara yekem bû ku beşdar tevlî civînek, bi wî awayî dibûn û ci ji ber tengasiya wext, li ser hinek babetan berferehî nehatibû rawestan. Ji ber wê sedemê hinek babet bi awayeke berferef hatin rojevê.

Pêşiya em bikevin nava van babetan de, çima Bîrnebûn? Di destpêkê de di derbarê pêvajoya derketina kovarê de, desteka madî û manewî, dîtinêن di derbarê civaka herêmê yên erdnîgarî, çandî, civakî û aborî de axaftina vekirinê hate kirin. Beşdaran

ku car caran bi  
pirs û şirovên xwe  
tevlî gotûbêjan  
dibûn, bi pirsa;  
gelo hê em dikarîn  
ci bikin? Di-xwastin  
çarçewe were berfireh  
kirin.

Çi di derbarê  
îradeya derxistina  
Bîrnebûnê de be  
û ci jî rastiya ci-  
vak a Kurdên  
Anatoliya navîn û  
bi rêxistinek e ku karibe pêdiviyên wê  
civakê bi demdirêjî li ser milên xwe  
bigir, ji hêla besdaran de bi berfirehî  
hate gotûbêj kirin. Bi taybetî li ser  
giringiya şikestin û bi hevûdu nekirina  
pirsgirêkên mîna ziman, çand û hwd.  
û bi sazîbûneke ku karibe bike û  
mirovêñ herêmê pêwendiyân û  
pişgiriyê bi hevûdu re çêbikin, hate  
rawestan. Ji hêla piraniya besdaran ve  
hate pejirandin ku hewldan ji bo weq-  
fek e bi nasnameyek huquqî werin  
dayîn. Da ku ev pirsgirêk bi rêya wê  
weqfê werin çare-  
serkirin. Ji bo saz-  
kirina weqfê komisyonek ji bo  
pêşxebatê û lêkolîn-  
nê hate çêkirin.  
Ramana ku ev komisyonâ  
ji çar kesan pêk tê xebatê  
xwe bi redaksiyona  
kovarê re bimeşî-  
nin hate pejirandin.



Hinek ji besdarêñ civîna Kôlnê

Civîn êvarî bi kokteylê û bi pêşen-  
geha nûnerê redaksiyona kovarê,  
hunermend, Bekir Dari hate  
berdewam kirin.

Di roja duwemîn de li ser qadêñ  
ku weqf li ser bisekine, kar û wê çawa  
were sazkirin hate rawestandin. Ji bo  
weqfê komîteyek ji çar kesan hat  
hilbijartin. Ev komîte dê ji bo ava-  
kirina weqfê haziriyyê pêşiyê bike.  
Civîn piştî xwarina nîvro bi xatir ji hev  
xwestinê xilas bû.



Ji civîna Kôlnê

# Toplantıdan izlenimlerim:

Bîrnebûn'un Köln'deki 2.yıllık toplantısı için gelen davetiyeyi alınca çok heyacanlanmıştım. Haksız da degildim. Üç yıldır Orta Anadolu Kürtlerinin kültür, sanat ve tarihini araştırmak üzere üç-beş arkadaşın çabaları ile yayın hayatına başlayan Bîrnebûn hiç emeklemeden 10. sayısını okuyucuya ulaşırma başarısını elde etmişti.

Aynı dergide beraber yazdığımız arkadaşları daha yakından tanımak, sorunlarımıza ve görevlerimizi tartışmak, gerçekliğimizi gözümle görmek beni heyecanlandırmıştı.

Bana göre Bîrnebûn'un omuzlarındaki yük artıyordu. Orta Anadolu Kürtleri söz konusu olduğunda insanların aklına Bîrnebûn geliyordu. Med ve Medya TV bu üç yıl içerisinde Orta Anadolu Kürtleri üzerine iki program yaptı. Her iki programda bîrnebûn redaksiyonundan konuşmacılar çağrılmıştı. Bu ve buna benzeyen nedenlerden dolayı bana göre Bîrnebûn bir atılım yapmak durumundaydı.

Aslında bu yoğunluktaki toplantılara alışık birisiyim. Bu kadar düzeyli, bu kadar birbirine saygılı, görevinin bilincinde olan meseleleri birbirine karıştırmadan kültürel ve siyasal çalışma yapan, net görüşler ortaya koyan az insan gördüm.

Her oturumda bir katılımcının görüş beyan etmesi ve hiç kimsenin yüksek sesle konuşmaması beni çok mutlu etti. Oturum aralarında ve geceleri yapılan tartışma ve kulisler toplantıyı çok renklendirdi. Beko'nun o kıvrak zekası ile ürettiği eleştirel espirileri, Vehbi'nin kedisi Gundı ile ilgili sohbetleri, Şixo'nun Karcadağ fikraları, son geceki Kokteyl ve sonrası kulisler, her köşeden yükselen memlekete hasret türküleri, gelecekte Bîrnebûn çalışması içerisinde görmeyi umut ettiğimiz bebeklerimiz; Zînê, Berzan, Miran, Tamo, Bekir, Hamo, Barış'ın koridorlardaki bağışmaları, koşuşmaları unutamayacağım güzelliklerdi.

Redaksiyon tarafından son oturumu idare etme görevi verilen Kidê Sultan'ın konuşmayı yeni öğrenen bebeğin konuşması kadar güzel olan Kürtçe toplantıya ayrı bir hava kattı.

Anlayacağınız içim heyecan ve coşku dolu. Toplantıdan ayrılamıyorum. Bîrnebûn'un 2. sayısında bir okur mektubunda "Xas bi Me" diyor.

Bende aynen "Xas bi Me" diyorum.

Mem Xelikan

## İşte bu toplantıda

Bîrnebûn redaksiyonu, yazarları, dağıtmacıları ve çalışan taraftarları ile birlikte önüne koydukları ilkeleri laiki ile yerine getirebilmek için Vakıf kurma kararını alarak bu işte ne kadar güvenli adımlarla yürüdüğünü ortaya koydu.

**Her birisi** değişik siyasi organizasyon ve geleneklerden gelen bu insanlar sanki eskiden beri hep yan yana olmuş demokratik bir aile yapısı segiliyorlardı. Bu Kürtlerin bu güne kadar pek beceremedikleri bir güzellikti.

# KOMA KURDÊN ANATOLIYÊ, BÎRNEBÛN Û ROLA WÊ

Kefşkirina civateke ku ji bîrbûyî

**H**ETA DÜH Û PÊR, WEXTA KU QALA Kurdên Anatoliya Navîn diwû, civateke nenas û jibîrbûyî dihata ber çavan. Zanîna derheqa wana da pir hendik wû.

Li dervayî cografya Kurdistanê, li Anatoliya Navîn jî Kurd hene. Koma Kurdên Anatoliyê zûva da ye, ku li vê derê bi cî û war e, xwediya herd û mulk e.

Qasî ku em huro dizanin. Di hundurê sînorêن mezinbajarêن Anatoliya Navîn da (Enqere, Konya, Kırşehir, Aksaray, Yozgat, Çorum, Amasya, Tokat, Sivas, Kayseri, Kastamonu û yd.) bi sedan gund û piçûkbajarêن Kurda hene. (Li Enquerê 102, li Konyê 75, li Kırşehirê 52, li Aksarayê 39, li dorbera sinorêن Yozgat-Tokat-Amasyê 41, li Kayseriyê 23 gundêن Kurda hene.)

Nufusa Kurdên Anatoliyê, ji sedî sed nayê zanîn. Lê bi texmîn ew ji mîlyonekî zêdetir e. Kurdê Anatoliyê bi sê zaraveyêن Kurdi dengdikin (Kurmancî, Şêxbizinkî, Dimilkî). Ew ji axzê dîn da jî bi sê birra bûne; Heneñî, Şafî û Alewî ne. Kurd, kom bi kom, di ber sazkirina Cumhuriyeta Tirkîyê, qasî 200an hîn zêde sal berê hatine Anatoliya Navîn. Ew geh bi dilê xwe, geh bi zora fermanê padşahêن Osmaniya li vê mintiqê cîwarbûne.

Wexta ku hatine, ew eşîr û qebile bûne. Bi dehan eşîr û qebile ji her derên Kurdistanê vejetîne hatine van ciwaran. (Canbegî, Şêxbizinî, Reşî, Mikailî, Ruta, Zirkî, Terkî, Sidunî, Qilorî, Doykan, Motikan, Şexbili, Bilki, Hêcîbî, Atmana, Bazikî, Millî, Bereketî, Mîfkî, Oxçî, Pisî, Sêwidî, Cutkî, Xelikî, Omerî, Sefkî, Celkî, Nasîrî, ...)

Derheqê Kurdên Anatoliyê da zanîna me hîn kêm e. Ya heyî jî bi devkî ye. Tiştêن bi nivisi û li gora qeydeyên ilmî hetanî dûh û pêr qe tunebûn.

Çend gerok û lêkolînvanê ecnebî hen tişt nivîsîne evqas. Ji wana, lazim e ku meri Perrotê Frensî bi nav bike. Wî li ser Kurdên dorbera Haymanê, zêdeyî sed sal berê, tiştêن xwes nivisiye.

Ji Kurdan bi xwe, xêyî çend iştisna, kesî tu tişt nenivisiye. M. Emîn Zekî, di kitêwa xwe ya bi navê, "Kurdistan Tarihi" de, 75 sala berê, cih dayê hen cî û navê eşîrên Kurd yêن li Anatoliya Navîn.

Yek jî, Curikîyê rehmetî (Osman Alabay) ye. Ew iştisnakî bi nav û deng e. Wî bi salan û bê westîya pir nimûneyên folklorâ Kurdên hêla Yunak û Heymanê berhevkirîye û nivîsaye. Me di pelikêن her hêjmara Bîrnebûne

da, şûn da berhemên wî. Curikî sala çûyî mir, çû rehmetê.

Çi şexis, ci parti û rôexistinê Kurda, hetanî van salên çûyî, hay ji Kurdên Anatoliyê nebûn. Kurdê Anatoliyê bi xwe jî hewês nekirine, ku tarix û kultura xwe der-xin meydanê, bî-nivisîn, nasbikin û bidin nasîn.

Pirê wana dî-pirsin, tewêن, "Kal û pîrên me çîma û kingê hatine Anatoliya Navîn?" yan jî, "Eger Kurdistan xelas biwe, emê cir biwin?" Lê wextê ku dor tê cewaba van pîrsan, kes xwe na-êşîne, nade ber kar û hewldanan. Ronakbîr, xwenda û siyasetmedarêن

Kurdên Anatoliyê pir in û di nav xebata siyasî da ne. Meri dikane biwê, wana dûr fîkrîye, lê ber xwe nedîye.

Di destpêka sala 1990î da ew di xwe da livîyan. Mîsal, sala 1992an, di hen rojname û kovarên Kurdi da, (Azadî, Özgür Gündem, Deng, Cûdî, Jîyana Nû, ...) çend miqale û lêkolîn derheqa Kurdên Anatoliya Navîn da neşirbûn. Di eynê salê da, du kitewên piçûk hatin weşandin. Kitêwa Gabar çiyan "Tarihte Kürt Sürgünleri" û ya Nuh Ateş "Îç Anadolu Kürtleri". Di van salana da pîrsa Kurdên Anatoliyê kete rojeva siyaset û xebata Kurda, xasme ya Kurdên Anatoliyê. Dema xwenasinê, lêgerîn û lêkolînê ji bo Kurdên

Anatoliyê destpêkir. Li ser teklifa hen hevalan, xasme ya Dr. Mîkailî, birek Kurdên Anatoliyê sala 1993an li Elmanyê, li bajarê Kolinê kombûne ser hev. (Bekir D., Dr. Mîkailî, Necatî S., Ali C., Huseyin K., Nuh A.)

Amanc ew bû, ku ew him hevûdu nasbikin, him jî li ser hal û hekata Kurdên Anatoliyê fîkrêن xwe ji hevûdu ra biwêن. Li dawîyê, ew li ser hewcedarîya derxistina kovar an rojnameyeke lêkolîn û Kulturî hemfîkir bûwûn. Lê ne xêr, di pretikê da tu gav nehatin avêtin. Di eynê salê da, li welat, li K. yê jî civînek çêbû.

Komikek Kurd di vê civînê da li ser pîrsa Kurdên Anatoliyê dan û standin û xwastin ku weşanekê derbixin.

## DERKETINA BÎRNEBÛNÊ

Sala 1996 an Hecî E. daxûyanîyek di rojnama Özgür Politikayê de da weşandin. Têda dihate gotin, ku kovarek bi navê Bîrnebûn dê derkeve, ew li rê ye. Di dexûyanîyê da, navê Mehmet B., Fatin K., Nuh A., wekî nivîskarê kovarê hatibûn nîşandan.

Însiyatifa Hecî li cih û bi kêr bû, lê spontan, vê hazırî û bi kemasî wû. Ne redaksîyonek hewû, ne pere, ne jî plan û program.

Hecî dil hewû ku kovarê li Stembolê (Tirkîyê) bide weşandinê. Wext derbasbû, lê Bîrnebûn derneket. Xûya bû, ku şertên derxistina Bîrnebûnê li Stembolê tunebûn. Sala 1996an civînek li ser teklifa Dr. Mikailî li bajarê Duisburgê çêbû. (Mehmet B., Hecî E., Sultan D., Dr. Mikailî, Nurşen K., Vahît D., Nuh A., Huseyin K.) Di vê civînê da qerar hate dayîn, ku ew dê Bîrnebûnê bi hev ra derxin.

Dîsa, di dawîya sala 1996an da, li bajarê Duisburgê (Elmanya) kombûnek çêbû. (Nurşen K., Hatîce Y., Suna D., Hüseyin K., Dr. Mikailî, Mehmet B., Nuh A., Muzaffer Ö., Haci E., Cahit D., û yd.).

Di vê civînê da, redaksiyonek hate bijartin (Nurşen K., Suna D., Mehmet B., Hecî E., Vahît D., Muzaffer Ö., Dr. Mikailî, Nuh A., Cahit D., Huseyin K.).

Dîsa, di vê kombûnê da, sewa derxistin, xerciyên Bîrnebûnê pere hatin berhevkirin: Dr. Mikailî 1000.-Merq, Hüseyin K. 500.-Merq, Nuh A. 500.-Merq, Vahît D. 400.-Merq, Hecî E. 100. Merq, Muzaffer Ö. 100.-Merq, Cahit D. 100.-Merq, Suna D. 100.-Merq).

Redaksiyona Bîrnebûnê, di civîna xwe ya siftê da qerar da, ku bîrnebûn li

Almanyê bê weşandin. Hejmara Bîrnebûnê a sifte di Zivistana sala 1997an da li bajarê Wetzler (Elmanya) hate weşandin.

Pêy derxistina hejmara siftê, Ali Ç. û Seyfoyê A. (ji Swedê) û Bekir D. (Elmanya) jî teve redaksiyonê bûn. Ji hejmara duduyan vîrda, Bîrnebûn li Stockholmê (Swed) derdikeve.

Endamên Redaksiyonê Nurşen K., Suna D. û Hüseyin K. demekê şûnda ji ber sebebê şexsî, xwe ji endametîya redaksiyonê kişandin. Lê ew wekî hevalê Bîrnebûnê man.

**Di tarîxa çapamanîya**  
**Kurdî da, çireya pir**  
**kovarêñ Kurdî zû**  
**vemirîye. Yek sebeb**  
**tim ew bû, ku Kurd li**  
**wana xwedî derne-**  
**ketine. Bi şor gotine**  
**erê, baş e, rind e, lê**  
**wexta dor hatîye**  
**alikarî û xebatê, xwe**  
**badane.**

## LI HEMBER WENDABÛN Û BÎRNEBÛNÊ

Kurdên Anatoliyê jî parek ji miletê Kurd e. Pirs û daxwazên wana ji pir alîyan da wekî yên hemû kurdan in. Videşxistina azadîya mîlî, serbestiya ziman, kultur û huwîyeta kurdî mirazê wana ye jî. Lê ji hen aliyan da cûdatiyêñ wan ji hene. Cografya wana, cî ú herdê ku ew lê dijîn, rewşa wana ya aborî û sosyal cûda ye. Lowma, lazim e, ku van cûdatî û xasitîyêñ wan bêñ zanîn û berçavkirinê. Ew bêñ nivîsandin û têkevin nav belikên tarîxa Kurda.

Kar û xebata Bîrnebûnê, bi giranî li ser van beşen jêrîn in:

- Cografya Kurdên Anatoliyê
- Tarîx û nufûsa wan
- Ziman
- Dîn û kultura wan
- Hûner û edebiyata wana ya devkî û niviskî,
- Erf û edet û folklorâ wan,
- Jîyana wana ya aborî, sosyal
- Tevgêra wana ya eşîrtiyê derxe meydanê.

Derheqa van beşan da lekolîna pêkbîne, belge û resma biweşîne. Her çiqas hîn kêmânî hewe jî, di deh hêjmarên Bîrnebûnê da va kara hatiye kirin û li ber çava ye.

Komeke ku xwe nasnake, tarixa xwe nizane, hay ji folklorâ xwe nebe, bi zimanê xwe nenivîse û eseran neafîrîne, wenda dibe, ji bîr dibe. Bîrnebûn li hember wendabûn û bîrbûnê derdikeve.

## ENSİKLOPEDÎYA KURDÊN ANATOLIYÊ

Bîrnebûn berhema Kurdên Anatoliyê ye. Ew kovareke demsalî ye. Nivîsê wê bi kurdî û tirkî ne. Deh hejmarên Bîrnebûnê bi fedakarîya hevalên redaksiyonê, bi alikarîya havalên ku wê belavdikin, bi nivîs û peran pişta wê digrin derketin. Yanê va kar û xebateke civati ye û kolektîf e.

Di nameyên xwendavanvan da jî tê xûyakirin, ku Kurdên Anatoliyê ji derketina Bîrnebûnê razî ne. Ew wê wekî neynûk dihesibînin û xwe tê da dibinîn, pê wê şâ û serbilind dibin.

Ger meri deh hêjmarên Bîrnebûnê bide serhev û cîlt bike, ew diwe kita-weke ji hezar rûpelî. Meri dikane wê

wekî ensiklopediya Kurdên Anatoliyê bi nav bike.

Di van deh hêjmaran da, bi dehan nivîsên lekolînî, berhevkarî, werge-randî derheqa Kurdên Anatoliyê, tarîx, etnografiya û kultura wana da hatine weşandinê. Pir nimûneyên folklorâ Kurdên Anatoliyê (çêrok, kilam, gotinê mezinan, lîstik, erf û edet) di nav pelkên wê da cîhê xwe girtin û ji derbêñ wendabûn û bîrbûnê filîtin.

Cara siftê ye, ku di saya Bîrnebûnê da, bi dehan Kurdên Anatoliyê bi xwe li ser tarîx û kultura xwe û bi zimanê xwe dinivîsin. Va tiştekî pir bi kêr û bi qîmet e. Meri pê serbilind dibe. Mixabin, bi zaravêñ an lehçeyên Şêxbizinkî û Dimilkî nivîs tunin an pir kêm in.

Guman heye, ku ji Kurdên Anatoliyê jî ekoleke niviskarêñ Kurdi derkeve. Piranîya niviskarêñ Kurda yêñ bi nav û deng ji nav kar û xebata çapemenîya Kurdi da derketine meydanê û bûne hoste

Di gelek hêjmarên Bîrnebûnê da di quncê "Yörelerimizi tanıyalım" da pir cî û warêñ ku Kurd lê dijin hatin nasandin. Lazim e, ku ev xebata bê kûr kirin û cîhêñ wekî Çorum, Kastamonû, Sivas û.y.d. jî bêñ nasandinê.

Kemanî û ehtiyacê Bîrnebûnê jî pir in. Kar û xebata wê hîn bi giranî li ser qeydêñ amatoriyê dimeşin. Di cîhetên teknîk, belavkirin, abonekirin û peran da jî kêmânî pir in.

## KULTURA XEBATÊ YA NÛ Û DEMOQRATÎK

Karmendêñ redaksiyonê di destpêkê da hevûdu nasnedikirin yan jî hev û du ji dûrva da dinasîn. Fikrên wana

yên sîyasî cûda cûda ye. Hen bi rêexistînên sîyasî va girêdayî ne, hen bi serê xwe ne. Yanî redaksiyona Bîrnebûnê pirrengî ye.

Karmendêن Bîrnebûnê heta niha îmtîhaneke rind dan. Wana pêkanîn ku bi hevra kar bikin, bêyî ku hevûdu bieşînin û neçê bikin. Wana qedr û qîmeta hevûdu zanîn. Lihevhatin, hevdu guhdarkirin, konsensus dîtin ji xwe ra kirin prensîb û nehîştin ku siyaseta partîti têkeve navbera wan.

Siyaset ji her civatê û mileti ra lazim e, bê wê nabe. Lê ne şert e, ku meri wê têke nav her karî. Dûrxistina wê, ji kar û xebatê zimanî, kulturi, ji projeyên civakî, sîvîl û demokratik bi kêtir e.

Ronakbîr û xwendayên Kurda meçbur in, vê kultura xebatê li xwe mar kin û bikanin bi hev ra kar bikin. Ji ber ku ziman, kultur û tarix ne malê şexis û partiya ne. Ew malên civatê gîştka ne. Lazim e, ku hêz û huner bigêhin hev, bibin yek quwet.

## BELAVBÛN Û HAY JI HEVDU BÛYÎN

Kurdêñ Anatoliyê çiqas hay ji hevûdu hene?

Eleqê wana bi hev ra û dayîn û standinêñ navbera wana da kêm in. Di navbera wana da sinorêñ eşirtî, qebileti, mezhebi û zimani (devok û lehçe) hîn bi hukim in. Şer û reqebede nav eşîr û qebilan jî hîn ji kok da ranewûne. Li pir dera, xebat û reqebeda li ser helbijartina mixtarî û belediya hîn li gora qeydêñ eşîrtî û qebiletiyê tê kirin.

Ji esra bîstûyekan ra, dewrana gîlobalizmê tê gotin. Mîna ku tê gotin, dunya êdi biçûk bûye, bûye gundekî. Lê her gundekî jî, xwe ji derva va

vekiriye û bûye mehelekê dunyê. Mîna ku berx û mî li hevûdu dang dibin, li rû dunyê reng bi reng şexis, milet û civat, ton bi ton kultur tevhev dibin. Li her welitekî ji her mileti meri hene.

Kurdêñ Anatoliyê ji bir û belavbûne. Di hundirê çel salêñ ku çûyî da, ji her gundekî, kurda kom bi kom barkirine, çûne bajarêñ mezin û welatêñ Ewrûpayê. Li her welitekî Ewrûpayê iro komêñ Kurdêñ Anatoliyê jî bicîhbûne. Ew li welatêñ Ewrûpa jî li gora gund û eşîrêñ ku ew jê veqetîyan bişûnbûne. Mesela; Omerî li Russelsheimê (Elmanya), Şexbizin li Ahlen û Wormsê (Elmanya), Xelikî li Wittenê (Elmanya), Canbeg li Basel (Sîwîsra), Nasîrî li Danmerqê bişûnbûne.

Kurdêñ Anatoliyê li dervayî welat di şîn û şahîyan da, di dol û dawetan da, di şev û civînêñ sîyasî da têñ ba hevûdu. Eleqa wan bi vê rê û ji van aliyan da bi hev ra heye. Lê dîsa jî, ha li welat ha li dervayî welat, zanîna wana derheqê xwe û hevdu da hendik e.

Bîrnebûn dikane wana nêzke hevûdu bike û bi hevûdu binasine. Ew dikane boyî wana bibe dezgehekî komunîkasyon, danûstandin û kombûyînê.

## GOTINA PAŞİYÊ Û XEWNEPÊŞEK

Çel salî berê, wexta ku hîn Kurdêñ Anatoliyê nehatiwan Ewrûpayê, ku yekî bigota, çel salî şûn da, birek Kurdêñ me dê li Ewrûpa kovarekê derxin, yên dora wî dê bigotana, va yî dîn bûye, xewna diwîne. Lê va xewna iro bûye rastî. Em sehnê bigêhurin û herin pêşdemê. Em

biwên, em di sala 2010an da ne. Bîrnebûn li welat derdikeve û bûye kovareke hefteyî. Ew bi awakî profesyonel derdikeve; xanîyê wê û bi dehan nivîskar û xebatkarêن wê hene.

Li hen navçayên Kurdêن Anatoliyê enstîtûyêن lêkolînî, dersxanê zimanhêwisinê hatine avakirinê.

Hunê niha biwên wana xewn û xeyal in. Belki jî veng be. Lê jiyan bê xewn û xeyal nabe û nameşe. Sewa ku xewn û xeyal bibin rastî, fedakari, xebat, dezgeh û sazî (kovar, komel, weqif) lazim in.

Mîna ava zelal xay dike, ku Bîrnebûn jî me ra pir lazim e. Gere ku em li wê xwedî derkevin, destê xwe bi ser ra bigrin, ku emrê wê dirêj biwe.

Di tarîxa çapemeniya Kurdî da, çireya pir kovarên Kurdî zû vemiriye. Yek sebeb tim ew bû, ku Kurd li wana xwedî derneketine. Bi şor gotine erê, baş e, rind e, le wexta dor hatîye alikarî û xebatê, xwe badane.

Bi seri bakirinê, bi şikeyet û loma, bi şîrêt û pêşniyarkirinê tenê tu iş û kar nameşin. Dera ku, meri xwe bide ber kar û bara, bi qelem, bi hêz û hûnera xwe bikeve nav xebat û şuxilê.

Kovara Bîrnebûn jî axza pûl û peran da xizan e. Ew ne xwedîya buroyekê ye. Wekî demirbaş, tenê mikîneke wê ya fotografîşandinê heye.

Ji her hejmareke Bîrnebûnê 1000-1200 hev çapdiwe. Xercireha her hejmarekê, 6000 Merq in.

Ji her hejmarê li welat û Ewrupa tevhev 700 hev tê firotin û belavkirin. 80 aboneyên Bîrnebûnê hene. Ji hatinêñ me yên ku ji firotin û abonetiyê têñ, mesrefê Bîrnebûnê dernakeve.

Hen heval hene, malavabin, xwediyê kargehan in. Ew baxşî didin: (Mehmet Ö. 2500.-Merq, Osman G. 2000.-Merq, Şevki Ö. her sal 1000.-Merq, Ali C. 1000.-Merq, Cemal.C. 500.-Merq, E.Y.-250 Merq, Mesut G. 100.-Merq, Vehbi Ö. 200.-Merq, Mehmet G. 500.-Merq, İhsan E. 300 Merq )

Hen heval ji hene, jîrek in Bîrnebûnê difroşin û belavdikin. (Li Frensa-Şevki Ö. 25 hev, Lütfü Ö. 15 hev, Li Siwîsra-Hamit Ö. 100 hev, Behram A. 20 hev, Şevket B. 5 hev, A. Doğan 5 hev, Vehbi Ö. 10 hev, Mustafa S. 5 hev, Yusuf Y. 5 hev, Li Holland- Neçîrvan Q. 20 hev, Namdar Ç. 10 hev, Romî Y. 10 hev. Li Avusturya-Vahit P. 25 hev. Li Danêmark-Komala Kultura Kurdî û Danimarkî 35 hev. Li Swêd-Weoanxana Apec'ê 100 hev. Li Norweç Seyfi G. 10 hev. Li Elmanye Komalêñ Komkarê 80 hev, Şevket Ö. 8 hev, Tahsin D. 15 hev, Mehmet Ö. 15 hev, Temeli B. 10 hev, Xelikan Ş. 10 hev û yd. Li Tîrkiye-Toplum Kitabevi (Ankara) 50, Güç Kitabevi (Kirşehir) 10, Medya Kitabevi (İstanbul) 10 hev têñ firotin.)

Belavkirin û firotina Bîrnebûnê, abone û xwendevan zêdekirin wezifeke muhim e û li ber me dawestiye.

Hevalê û hevalo, de tu jî, bi kujekî vî karê huwyetnasîn û gerînê bigre. Tu jî teve vê xasxebatê biwe. Tevê biwe ku, şewqa Bîrnebûnê hîn gurleh biwe!

Avril 2000

*Jerenot:*

*Ev nivîsa jî aliye N. Ateş da di salcivîna (27-28 Gulanê 2000) Bîrnebûnê da bi navê redaksiyona Bîrnebûnê wekî xeberdan hate pêşkêşkirin.*



# HASAN HARMANCI


(HESÊ MALÊ ELÊ)

Yusuf Polat

**D**i nav kar û barê sîyasetê de ji Kurdên Konyayê, yê ku li Almanyê bi navê Hesen tê naskirin, ew rêberê jîr û jêhatî di bîst salîya xwe de dest bi karê civakî kir. Dema ku ew li welat bû karê xwe di Partîya Gel ya Komarî (CHP) de domkir. Di destpeka 60an de tê Almanyayê. Ausburg, Wuppertal, Westerwald û dawî li Frankfurtê kar kir. Li wan deran, wî ji xwe re heval û dost çêdikirin. Piraniya Kurdan, bi taybetî yên Konyayê digîhandin serhev; ruhê mirovatî, dostî, hevalî, welatparêzî, şorxwesi û delalî dida wan. Tevhev li xerîbiyê kîfxwêş dibûn. Di rojêng teng de bîranîna welat û kulên hesretî sivik dikir, şev û roj jî xwêş dikir.

Demê ku Hesen li her davî barkir hate Frankfurt, li refêن KOMKARê cih girt, mala wî bûbû mala gel. Bi piranî ji bo penaberêن Kurdên ku nû hatibûn bajarê Frankfurtê qor bi qor li mala Hesen diman. Hesen nanê xwe, parîyê xwe yê xwarinê, cîhê xwe yê razanê bi wan ve parve dikir. Ji hêlekê de karê fabrikayê, ji hêla din de jî karê welat û xizmeta gel de bû. Hesen bi wê fedakari, mirovatî, welathezî û gelhezî ji Kurdên Konyayê re bûbû rûmetî û serbilindî. Ew bûbû tîna rojê, şewqa hîvê.

*Bîranîn*



Hasan Harmancı

Dujmin nesekinî, çav berdan ser Hesen, dest da ser pasaporta wî, nedixwast kû Hesen ji bo Kurd û Kurdistanê kar bike. Ji bo wê yekê Hesen nedikanî kû nézî 22 salan here mal, here gund û welatê xwe. Dîsa jî Hesen ji karê xwe dest ber nade, çawa ku Kurd û Kurdistan ji bo wî wiqasî bîranînê wî yê xûdê û pêxember bi qîmet û rûmet bû. Dijî dest dayîna ser pasaportê, wî li Anquerê dawa vekir û ew dawa qezenc kir.

Li ser wê ew piştî 22 salan li 19.10.1999an da çû welat, çûbû gundê xwe. Demekê dost û hevalên wî bihîstin ku Hesen ji Almanyayê vedigere tîye welat, bi sedan mirov, heval, cîran û dostên wî hatibûn firokxaneya Anquerê. Xatûn Eşê, du

lawêñ wî yên mezin û min jî bi wî ra refeqatî kiribû. Em bi nîvê şevê gehiştinî gundê Bîrtalikê. Gundê Bîrtalikê hîn di jiyanê xwe de ew yeke neditîye. Herder biye mehser, him ji gundê wî him jî ji gundêñ din ewqes mirov gehiştine hev, benda hatinê Hesen bûn. Ew ji tomofîlê peya dibe; ci qeder ”şîn û şînayî“ li bo hev bû. Şîn hebû, çîma kû ewqas can û ciger çûne ser haqê xwe, Hesen him ew nedîne him jî xatîre xwe jî wan nexwestiye. Ji wan can û cîgeran hen jî ji malbatê wî bûn. Bi piranî şînê jinan ji bo wê bû. Ji hêlekê de jî ”şenayî û kefxweşî“ hebû ku, Hesenê delal piştî 22 salan vege riye welat. Piştî girîn û şînê mîr dikevin navberê, şînê diqadînin û terin cemâtê û êdî êdî xêrhatî û kefxweşî dest pê dike, rûyêñ wan dikenin. Xatûn Eşê min û Hesen di odayekê de li qonaxa jor dike xewê. Sibe rabûnî, Hesen piştî testê bi dê û bavê min re, heval û dostên wî yên herî kevn, bi telefon deng dike û min bi lawê xwe Şewket ve bi rê dexe, riyê Xelikan jêr.

Hesen bi kefxweşî û serbilindî vedigere Almanyayê. Edin hazırlîyê xwe ji bo vege rinâ welat dike. Benda teqewutê xwe bû. Teqewutê 60 salî. Ku ew piştra bi Xatun Eşê re tevhev herin gundê xwe Bîrtalikê ku jî me re bibe kanîyê avê, darêñ sêvan. Xastina me ew bû ku em xwe li Hesen bigrin, vege rinâ welat, lîstikê dujmin xerab bikin li welat cih bigrin. Hendik ma bû. 6 mehan berî teqewutê xwe Hesen di 6ê Gulanê da tere ser heqîyê xwe. Ew xebera xirab û reş wek bombayekî li Almanyayê diteqe. Bi sedan



Beşdariya Hesen berî 15 salan li nişana hevalên xwe.

heval û dostên wî li mala wî giheştin hev. Ji bo Hesen merasîmek çêdibe, ku hetanî niha ji kesên biyanî ra be taybetî merasîm çênebûne. Di xanîyê Goristanê Ditzénbach da merasîm çêdibe malbat, heval û dostên wî ji hemû Almanyayê beşdar dibin, digehin hev, ji hevalek, dostek, rêberek, bavek û apek delal xatir dixwazin. Pişî xatir xwastinê wî bi rê dikin, berbi firok-xanê Frankfurt.

Hesen, mirovê jîr û jêhatî, dema ku here mala xwe yê ebedî ji me xatir nexwest, nedikarî bixwaze ji. Ez bawer im, em gişt hemfîkir in ku ew ne bi dilê Hesen bû. Lê neçar e, felekê ew zû ji dest me girt bir. Wî welatê azadî, gelê azad nedît.

Hesen bi hezaran Kurda ra bûbû nan û av, dil û can, ew nesekinî, rûne-nişt bi şev û roj ji bo karê aborîyê zar û zêça û ji bo karê welat şixulî, ew kar

û barê recalê dayika xwe, cindiyê jinikê xwe ji me ra mînak e.

Çi serbilindî ji bermaliyê wî Xatun Eşê re ku Hesen mîrê wê bû, ci serbilindî û kêfxweşî ji zarokên wî re ku Hesen bavê wan bû. Ap û xal, xarzî û biraziyê xwe bû.

Çi kêfxweşî, serbilindî û serfirazî ji min re û ji yên mîna min re ku Hesen hevalê me, dostê me, rêberê me bû.

Felekê, mîrê mîran, şêrê şêran mirovê rûnerm û rûken ji dest me girt bir. Gundê Bîrtalikê carek din meşerê dibîne. Vê carê ne ji bo xêrhatin, kefxweşî û şenayîyê ku Hesenê delal vegevê welat, lê tenê bo heşîyan û şînê Hesen.

Mirovê şorxweş, şornerm û şorgerm Hesenê delal ji çû, çû ser heqîya xwe, bîr û bawerîyê wî ji me re ferman e.

# YUNAK KÜRTLERİ

Kenan Ü Muzaffer  
muzzafer@birnebun.com

Orta Anadolu Kürtleri tarafından bilinen ve bölge Kültürüne çok önemli bir değeri olan *Qamişê Qâl* destanı Yunak yöresinde yaşanmıştır. Bölgedeki düğünlerde zurnanın melankolik ve yanık sesiyle çalınmassa olmaz diye bilinen aşk öyküsü


**Y**unak; İç Anadolu Bölgesi'nin Konya bölümünde, Konya iline bağlı bir ilçedir. Konya ilinin kuzeybatısında olan Yunak ilçesi toprakları, kuzeyde Çeltik ilçesi ve Ankara iline bağlı Haymana ve Polatlı ilçelerine sınırlıdır. Batıda Afyon-Emirdağ'a sınır olan ilçenin güneyinde Konya'nın Tuzlukçu, İlgin, Kadınhanı ilçeleri, doğu da ise Cihanbeyli ve Sarayönü ilçeleri bulunur.

İlçe merkezi Konya'ya 190 km. uzaklıktadır. 1953 yılından beri ilçe olan yerleşim birimi, dalgalı bir arazi üzerinde kuruludur. İlçe topraklarının doğusunu ve güneyini geniş düzlıklar kaplar. İlçenin dolayları ise dağlıktır. Yüksek bir yayla üzerinde kurulu kasabanın deniz seviyesinden

yüksekliği 1000 m. dir. Karasal iklimin hakim olduğu yörede kişiler yağış ve soğuk, yazlar kurak ve sıcak geçer. Yazın suların çekildiği akarsuların görüldüğü yöredeki dar ovalarda kümeler halinde ormanlar bulunur.

İlçe merkezi (17.000), Y. Piribeyli, Koçyazı, Kuzören, Turgut ve Saray kasabaları ile köylerinin toplam nüfusu 60 000 civarındadır. Nüfusun çoğunu Kürtler oluşturur. Özellikle 1954-1970 yılları arasında toprak dağıtım komisyonlarının görev yaptığı dönemlerde dışarıdan nüfus akımına uğramıştır. Toprak alamayanların bir kısmı geldikleri yerlere geri dönmüşlerdir.

Yunak ilçesi bölgedeki ulaşım ağıının biraz dışında kalmıştır. Ulaşımını



Xariteyeke ku derûdora Yunakê nişan dide.

genellikle Konya-Afyon karayolu ile sağlanır. Bucaklar ve anayol kenarında olan köylerin yolları asfalttır. Diğer köyler ise staplize yollarla merkeze bağlanmıştır. Kış aylarında ulaşım zaman zaman aksamaktadır.

Yunak ve çevresi tarihin çeşitli devirlerinde bir çok kavmin uğrak yeri olmuştur. İlçe yakınılarında Roma ve Hitit devrinde kalma tarihi kalıntıları rastlanmaktadır. Sarıkaya Mağaraları, Turgut kasabası Miskomid Şehir harabeleri, Harunlar köyündeki kale

kalıntıları ve Karagöz Ağlı mevkisinde bulunan kilise ve şehir harabeleri buranın eski çağlarda -Bizanslılar devrinde- önemli bir yerleşim merkezi olduğunu göstermektedir. İlçenin kuzeybatisına düşen 2 km. mesafedeki Hacı İbrahim Dağı ismiyle bilinen tepenin yanباسında "Bayram'ın Hazine İni" adında bir mağara mevcuttur.

İlçe merkezinin tarihi yeni sayılr. Merkeze ve bazı köylere yerleşim 16. yüzyıldan sonra olmuştur. Selçuklu ve

Osmanlı dönemlerinde Kars, Erzurum, Erzincan, Elazığ, Malatya, Maraş ve Çorum illerine dağıldıkları; 16.yy başlarında ise doğudan batıya devam eden göçler sonunda Yunak bölgesine iskan oldukları söylenir. İskan olan 24 boydan 12'nin Bilbaşı 12'sinin de Gavesti (tamamı Canbeg aşiretinidir) adını taşıdıkları ve sırasıyla Hatırlı, Koçyazı, Meşelik, Sülüklü ve Saray köylerini kurdukları, 18.yy ortalarında ise Rus istilası nedeniyle göç ederek gelen aynı aşiretlere bağlı gruplar tarafından Yunak'ın kurulduğu yaşıllar tarafından anlatılmaktadır. Yunak'a ilk yerleşen aşiretler ve bugün taşıdıkları soyadlarına göre isimleri şunlardır.

Doykanlılar: Erşan, Ürün, Ulaşlar

Terkanlar: Telis, Altuner, Yavaşlar

Rışwanlı: Yoldaşlar, Bayatlar, Savutlar

Kanıklar: Ateşler, Severler, Karalar

Turlar: Turoğlu, Düzbayır

Bu ailelerin Yunak'a yerleşmesinden sonra çevre köylerden ve daha sonra Emirdağ'dan buraya göçler olmuştur. Yörükler ise 1870 yıllarında Antep, Antalya, Beyşehir yörelerinden gelmişlerdir. Bu bölgede, özellikle asimilasyon politikalarını hayatı geçirmek için Yörükler getirilerek Kurt köylerine yerleştirilmişlerdir.

Özellikle Kurtlerin yaşadığı köylere yörükler yerleştirilmek istenmiş kısmen de bu başarılımıştır. Bazı köylere de Afyon'un Emirdağ ilçesinden insanlar getirilerek buralara yerleştirilmişlerdir. Ayrıca yalnız yörüklerin yaşadığı köyler kurarak Kurtleri kuşatmaya almışlardır. Devlet

bu yörük köylerine her türlü yardım yaparak onlara toprak verip güçlenmelerini sağlamıştır. Bu köyler Kargalı, Siram, Ayriktepe, Cebrail ve Sevinç'tir. Bunlardan başka Bulgaristan göçmeni olup bölgeye yerleşen muhacirler vardır. Bunlar merkez ve Hacıfaklı köylerinde bulunmaktadırlar. Kürtler yoğun olarak tarım ve hayvancılıkla uğraşırken Yörükler ve Emirdağlılar genelde çocukların okutmaktadır. Devlet memuru olanlar; özellikle son yıllarda bunlardan çoğu özel tim ve asker (uzman çavuş) olmakta ve Kurt illerine giderken oralarda halka zulüm yapmaktadır. Tabiki bu durum köylerine geldiklerinde de devam etmektedir. Birçok olay ve tatsızlıklar meydana gelmektedir. Son yıllarda ayırmada da artmıştır.

Bölgедe bulunan Kürtler 1960 yılına kadar kapalı bir ekonomi ile yaşamışlardır. Bütün ihtiyaçlarını kendileri karşılamış gereklı olduğunda ileri gelenler şehire gitmişlerdir. Türkçeyi öğrenmek gibi bir zorunlulukla 1960 yıllarından sonra karşılaşmışlardır. Özellikle radyonun köylere girmesi, okulların açılması, nisbeten yolların yapılması, kapitalist tarım araçlarının çoğalması asimilasyonda etkili olmaya başlamıştır.

Yunak halkın temel geçim kaynağı tarımdır. Bu durum hayvancılıkla beraber, özellikle köylerde kendisini net bir şekilde ortaya koyar. Ekonomik sıkıntılar, işsizlik ve toprağın parçalanıp küçülmesi sonunda; köylerdeki nüfusun büyük bir kısmı Polatlı, Konya, Akşehir ve Yunak merkeze taşınmıştır. Birçok

köy bakımsız ve harabe görünümündedir. Bölge Kürtlerinin önemli bir miktarı da Avrupa'da yaşamaktadır.

Yunak ve köylerinde meskenlerin çoğu taş-ağaç karışımı malzemeden yapılmıştır. Bunun yanısıra kerpiç evlerin ve kullanımı çok eski tarihlere uzanmayan tuğla evlerin varlığı dikkat çeker. Evler geniş bir avlu içinde ve yüksek duvarlarla çevrilidir.

Yunak Kürtlerinin tamamı Kurmancı lehçesini konuşmaktadır. Günlük yaşamda, köylerde özellikle ihtiyaçlar Kürtçe konuşmakta, gençler ise Türkçe konuşmaktadır. Kürtçe öğrenmek için ciddi bir çaba içinde değildirler. Bu duruma rağmen ulusal bilinçte gelişip yaygınlaşmaktadır.

Orta Anadolu Kürtleri tarafından bilinen ve bölge Kültürüne çok önemli bir değeri olan *Qamişê Qul* destanı Yunak yöresinde yaşanmıştır. Bölgedeki düğünlerde zurnanın melankolik ve yanık sesiyle çalınmassa olmaz diye bilinen aşk öyküsü dergimizin 1. sayısında Kürtçe olarak yayınlanmıştır. Geçen zaman içerisinde dergimizi arayan okuyucularımız Kürtçe konusundaki yetersizliklerini belirterek, bu destanı dergide Türkçe olarak tekrar yayımlamamızı istemişlerdi. Yunak Kürtlerini yazarken biz de özet olarak bu destanı Türkçe olarak aktaralım.

..... Aşiret reisi Alişer bu bölgedeki bir savaşta öldürülür. Onun yerine Kınco geçer ve mal varlığına el kor. Karısını zorla alır. Alişer'den 4 yaşında MİRCE adında bir kız çocuğu yetim kalır. Yeni beyin karısı olan annesi hastalanır, ölürlü ve MİRCE öksüz kahr. Onu ninesi büyütür.

Yıllar geçer, MİRCE güneş gibi parlayan bir genç kız olur. Genç kızlar birgün topluca Polathisar pazarına giderler. MİRCE orada gezerken XİNTO ile karşılaşır. XİNTO da onun gibi yetimdir. Onu dedesi büyütmiş, kendisi gibi demirci olarak yetiştirmiştir. XİNTO'nun hünerli ve güclü ellerinden geçen demir zamanın ihtiyaçlarına göre keser, balta, kama, bıçak, kalkan ve kılıç olarak şekil almaktadır. Göz göze gelen bu genç, ilk bakışta birbirlerine akan iki yıldız gibi aşık oluyorlar. Aşkları tüm çevreye yayılır. Dedesi ve tüm çevredekiler bu sevdadan vazgeçmesini isterler ve nasihatlar ederler. Ama sevdalı olan XİNTO'nun kulakları duymaz, gözleri başka bir şey görmez.

Mir bu aşktan haberdar olur ve MİRCE'yi Konya Paşasına vermek ister. MİRCE bu durumu öğrenir ve XİNTO'ya anlatır. Sevdahılar birlikte kaçarlar. Akrabalarının bulunduğu köylere doğru giderler ve Mangal Dağındaki bir mağarada saklanırlar. Günler geçer, erzakları biter. XİNTO ile MİRCE bu çıkmazdan kurtulmak için çare ararlar ve XİNTO yakındaki köye gidecek erzak getirecektir. Bu arada Mirin adamları bunları aramaktadırlar. XİNTO gece gizlice köye ulaşır ve aldığı erzakla geri döner.

İlerleyen gecenin karanlığında MİRCE mağaradan çıkar ve biraz oradan uzaklaşır, yolunu kaybeder ve mağaraya geri dönemez. Açı ve susuzluktan bitkin olan MİRCE yere yiğilir. MİRCE'yi gören yabani hayvanlar ona saldırır ve öldürürler. MİRCE kanlar içinde cansız yerde kalmıştır. XİNTO döner ve MİRCE'yi mağarada bulamaz.

Ormanlık ve sazlık olan bölgede onu aramaya başlar. Dört tarafa dolanır ve ona seslenir, cevap alamaz. Yakında bulunan dejirmene gider ve olanları anlatır. Dejirmenci sabahın ilk ışıklarında yüksek bir yere çıkışını kuş ve böceklerin hangi yöne doğru uçtularını görüp oraya doğru gitmesini öğütler. Xınto yola çıkar, dejirmenci de gizlice onu takip eder. Söylenenleri yapan Xınto, Mirce'nin cansız bedenini kanlar içinde sazlıkta bulur. Dejirmenci kendisine yetişir ve birlikte Mirce'nin cansız bedenini alıp dejirmene gelirler. Civar köylerden olayı duyanlar dejirmene gelirler. Defin işlemi yapılır. Büyük bir kaya mezartaşı olarak kullanılır ve çiçeklerle mezar süslenir.

Kısa bir süre sonra bölge Kürtleri zalım ve acımasız olan beylerine karşı güç birliği yaparlar. Ona karşı savaşırlar, yenerler ve kafasını keser tüm ahaliye ibret olsun diye köy köy gezdirirler. Yerine Miço geçer.....

İşte kısaca özeten destanın hikayesi böyle. O günden günümüze çok uzun yıllar geçmesine rağmen, Orta Anadolu Kürtleri sözlü edebiyatları nedeniyle değerlerini unutmadan günümüze kadar taşımışlardır. Bölgede her kaval çalan bu aşk hikayesini bilir. Düğünlerde zurna ile çalınan bu destan halen varlığını korumaktadır.

Dini inançları; önceleri Alevi olan bölge Kürtleri, daha sonra sunni

olmuşlardır. Hanefi mezhebindirler. Özellikle 1975'ten sonra gelişen Ulusal sorunun çözümü konusundaki çalışma ve çabalar Yunak'ta da ses getirmiştir. DHKD ve DDKD gibi örgütler buralarda etkin olmuşlardır. 1991 yılında HEP Yunak ilçe örgütü kurulmuş ve ulusal bilincin gelişmesine katkı sunmuştur. Üniversitelerde okuyan gençler yazın Yunak'a geldiğinde bilgi ve birikimlerini insanlarımıza taşımaktadırlar. 1995 seçimlerinde EBÖB (Emek-Baş-Özgürlik Blogu) ciddi miktarda oy almıştır. Aynı şekilde 18 Nisan 1999 Genel seçimlerinde DBP (Demokrasi ve Barış Partisi) ve HADEM (Halkın Demokrasi Partisi) önemli bir oy potansiyeline ulaşmıştır.

Yunak ilçesini tanıturken belirtilmesi gereken diğer bir konu da bölgeden çıkışlı bazı şahsiyetlerdir. Yunaklı Molla Rahim yazdığı beyitlerle tanınmıştır. Dergimizin 7. sayısında bir örnek yayınlanmıştır. Dergimiz yazarlarından olan ve geçen yıl kaybettigimiz Osman Alabay'ı (Curikî) da anmak gerekir. Ayrıca burada isimlerini sayamadığımız, Türkiye'de ve Avrupa'da siyasal partilerde, demokratik kitle kurumlarında, insan hakları ve demokratik mücadelede yerini almış onlarca insanımızın da var olduğunu belirtelim. Konya Büyükşehir Belediye Başkanlığı yapmış Doç. Dr. Halil Ürün de bölge Kürtlerindendir.

## YUNAK İLÇESİ

### Yerleşim Birimi

İlçe merkezi  
Altınöz  
Ayrıtepe  
Beşiklı  
Böğrüdelik  
Cebralı  
Çayırbaşı  
Eğrikuyu  
Hacifaklı  
Hacıömeroğlu  
Harunlar  
Hatırh  
Hursunlu  
İmamoğlu  
Karayayla  
Kargalı  
Kıllar  
Koçyazı (B)  
Kuyubaşı  
Kuzören (B)  
Kurtuşağı  
Meşelik  
Odabaşı  
Ortakışla  
Özyayla  
Saray (B)  
Sertler  
Sevinç  
Sıram  
Sinanlı(Suhe)  
Sülüklü (B)  
Turgut (B)  
Yavaşlı  
Yeşiloba  
Yığar  
Y. Yeşilyayla  
A. Piribeyli (B)

### Yerleşik Halkı

Kürt-Yörük  
Yörük  
Yörük  
Kürt  
Kürt-Muhacir  
Yörük  
Kürt  
Yörük  
Kürt  
Kürt  
Yörük  
Kürt  
Emirdağ  
Kürt  
Kürt  
Yörük  
Emirdağlı-Kürt  
Kürt  
Emirdağlı  
Emirdağlı  
Kürt  
Kürt  
Kürt  
Kürt  
Kürt  
Kürt  
Kürt  
Kürt  
Kürt  
Yörük  
Yörük  
Yörük  
Kürt-Yörük  
Kürt-Yörük  
Kürt  
Yörük  
Emirdağlı  
Yörük  
Yörük  
Yörük  
Kürt-Yörük  
Kürt-Emirdağlı

## BEDELÊ KÊN

Nuh Ateş

nuh@birnebun.com

Miçoyê Homê ji mal derket, çû camîyê ku nimêya yasîna bike.

Kur û kulfetê wî li mal rûniştîwûn. Hur û mezin, keç û lawên malê li dora dapîrê kombûn, jê çêroka Kulek rucu kirin. Dapîrê siftê nazî kirin, kire kem û kum, paşê xatirê newîyê xwe neşikena û dest pê çêrokê kir.

- Ci hewûye ci tunewûye, jineke pîr û sê lawikê wê hewûne. Jin bi sala ne pîr wûye. Mêrikê wê mirîye, qeramê wê giran bûye. Wê sê lawik bi tenê mezin kirine. Ji ber qeramê giran, porê wê sipî, mîna herîyê bûye. Lowma jê ra gotine pîrê.

Sala daye dû sala, lawikê pîrê mezin bûne. Rokê, pîrê bangê wana kiriye, gotiye, werin û rind guh bidin ser min. Ezê êdî bi sala jî pîr bûme û nikanim we bi xwedî bikim. Li vî diyarî rizqê we tune. Barkin, serîyê xwe heynin herin diyarênen xerîb, li rizq û nesîwê xwe bigerin.

Şîretê ku ez niha li we bikim, qe ji bîrmekin. Ku we ji bîrkir, ez heq û şîrê xwe li we halal nakim.

Hunê diziyê, derewa, nerindî û neheqîyan nekin. Duxîna xwe li ber heramiyê vemekin. Ma hunê tim bi qîret win û zû zû aciz mewin.

Wê rê nişanî lawên xwe kir. Vi yê mezin ra go, tu berve roava here. Vi yê

hortê ra go, tu berve başûr here. Vi yê piçûk ra go, tu jî berve rohelat here. Çiqinê wana dane dest û go, de herin, paş xwe va mîsmekin, xwedê işê we rast wûne.

Lawik rawûn, çûn destê dayîka xwe maçkirin xatirê xwe ji wê û ji hev du xwastin û vi rî ketin.

Pîrê di dû wana êpî mîskir. Hûndûrê wê keliya û hestirk ji çavan da hatine xwarê.

Lawikê pîrê, yê mezin û yê hortê pir çûn û hendik çûn, her yek li derekê bi cî û war bû. Yê mezin li ba axakî bû şivan, yê hortê li gundekî bû gavan. Lawikê piçûk bi şûn newû. Ew yekî qutî jar wû. Bi ser da, li ser nigê rastê dikuli. Yê derdora wî jê ra digotin, *Kulekê pîrê*. Wexta ku ew hîn derguş û di kundaxê da wûye, al xwe avêtiye ser, nig ji wê da pûç maye. Sewa kulekiyê, tu kes bi wî qayîl netiwû. Tu kesî ew şivan û gavan ranegirt. Lê wî disa jî saxiya xwe ji gerînê nedikir. Ew bi sewt û ìnad, diyar bi diyar li rizq û mirazê xwe gerîya.

Rokê, ew pir westîya, xiş û xal hate gundekî. Li dawîya gund, li mala pîrekê bû mîvan. Pîrê sure wû.

Kulek hal û heqata xwe ji pîrê ra katkir. Dilê pîrê pê şewitî. Pîrê pêçkê şûn da, ew dawetê oda mîvana kir. Li

wê derê, sifre dagirtiwû. Li ser sifré heft qaw xarin hewûn.

Kulek mat ma. Wî di ber xwe da go, pîrê li ba min wû, va sifra kê dagirt! Wî ina kir, ku pîrê sure ye.

Pêy xwarinê, pîrê go, eza niha surekê bidim te. Lê dera ku tu wê ji kesî ra katnekî. Ku te katkir, tesira wê namê. Pîrê di guhê wî da, kire piste pist. Paşê go, ku tu ketî tengîyê ya jî ku belayek hate serî te, vê surê wûne bîra xwe. Hîngê meleka nesîwdayînê dê xwe bigîhîne te. Ku te ji wê ci xwast, ewa wûne şûnê. Te go, min bike gogercî, ewa te bike gogercî. Ku te go, min bike şêr, tê biwî şêr.

Ji bîr meke, sur tenê bi şev bi hukum e, bi ro tu yê berê yî.

Pîrê di pencerê ra çiyakî dûr û bilind bi wî nimand û go, mêske, vî çiyayê hanî serî bi dûman dibîmî?! Li navî çavê wî, qela û qonaxa Mîrê çiya heye. Keçikeke wî heye, navê xwe Pêrîxan e. Ew rinda dûnê ye. Wexta ku ew di baxçê qonaxê da digere, herd û ezman ji eşqa ra di şûna xwe da dilizin. Dar û ber, însan û heywan lê radibin sérê. Nexwaş, kûr û topalên van deran diherin cêm wê, li ber şewqa rindîya wê xweş dibin.

Heta ku bi mîr û mîrîmîranê Mixrib û Misirê gêh, hatiûn ber nigên wê, lê xwezginî derketin. Lê Pêrîxan bi tu kesî ji wana qayîl newû, teklifé wana bi şûn da vegerandin.

Qeder e, bêyi ci,rokê siwarêñ Mîrê Hûta hatin Pêrîxan revandin birin, ku li Mîrê xwe markin. Ji hîngê vir da, Pêrîxan di dest hûtan da hêşîr e.

Bavê Pêrîxanê ji çar hêlê dunê ra xewer şand û go, ku kîjan cihêmêri

Pêrîxana min ji dest Mîrê Hûta xelaskir anî, ezê Pêrîxanê li wî mar kim û text û taca xwe jê ra bi xelat kim.

Lê heta niha, tu kes ji heqê Hûta nehatîye der. Kî ji vir da çûye, ji wir da nehatiye.

Welatê Hûta li paş heft çiya ye. Li pişa çiyayê hefta înek heye. Li ber deriyê inê marekî heftserî nowedar e. Ew tu kesî bernade hundur. Ji inê da berjêr, heft qata di binê herdê da, bajarê Hûta heye. Li pîyê rastê, li ser heft qata qonaxa Mîrê Hûta bilind dibe. Li pîyê cepê, zîndana wî ya reş heye. Pêrîxan di wir da hêşîr e. Şeşhezar û şesed û şêşt û şeş siwarêñ Mîrê Hûta hene. Her yek hosteyê reqeço ye.

Pîrê şora xwe xelaskir. Kulek rawû, destê pîrê maçkirin û xatirê xwe jê xwast, derkete derva.

Li derva şeveres wû. Wî sur anî bîra xwe û vi melekayê ra go, min bike têyr. Ew bû têyr û virîya çû. Wê şevê ew gihêste welatê Hûta û nêzikî inê danışt.

Vê carê ew kete tonê ejderhakî. Nêzke Înê bû û ku ci quweta wî heye topkir û pê pife marê heftserî kir. Mar cîlê di şûna xwe da, ji serma hişk bû, cemidî.

Kulek kete inê û heft qata daket û gihêste bajarê Hûta. Ew geh kete tonê Rûstemê Zal, geh bû Hemê Musê û Gelhê Sharê. Gurz di dest da, ew kete nav siwarêñ Mîrê Hûta, ew birbelav û qirkirin. Paşê wî çû Pêrîxan ji zîndana reş xelaskir û anî mala bavê.

Mîrê Çiya li ser şora xwe dawestî. Wî Pêrîxan li Kulek markir, text û tacê

xwe jê ra kire xelat. Zewac bi dilê Pêrîxanê wû jî.

Çel ro û çel şev li dohlê xistin. Sêni û şahîya dohl û daweta Pêrîxan û Kulek nam da û li çar hêlê dunê bû çêroka dohl û daweta bûk û zavan. Kulek bi şev dikete tonî mîrekî bi şûhret, bi bejn û bala, bi ro dîsa tewû Kulek.

Pêrîxan û Kulek bi hev ra bextîyar wûn. Kulek êdi bû Mîr Kulek. Wî meriyê xwe şandin pêy dê û birayên xwe. Ew anîn li ba xwe bi şûn kirin.

“Çêroka min çû qametê rehmet li vê civatê.”

Dayika kurika, Zêwa Hecî li oda din nivîn rêexistin, dû ra vegevîya oda rûniştinê û go:

- De bes e, şev hatiye nîvê şevê. Mêskin, gaz di çirê da nemaye, ew kûrik bûye. Rawin rakevin

Dora dinê royê, bi nîvro, Zêwê Hecî li odê, pişta xwe da balifeke xalînî rûnişt. Wê bange keçîka xwe kir û go:

- Sarê tenek av têke tasekê û şeyê serîya jî wûne, ku ez porê te buhûnim.

Sarê tasek av û şê heyna anî û diyna hêla diya xwe û bi xwe jî li ber wê rûnişt, mîna ku bikeve hembêza wê.

Du ro berê, şeva înê Sarê serê xwe şûştîwû û porê xwe kiriwû du gulyê qalin.

Zêwê her du gulyê wê verşandin. Sê li avê xist û pê porê Sarê, ji pêşîya heniyê da bigre heta dawîyê ewlek bi ewlek şe kir.

Porê Sarê mîna mûyê reş wû. Wexta ku şil bû û hate sekirinê sisik diwû û dibiriqî.

Zêwê ji axza çepê da, di bin gepirê da, bi destê çepê bi por girt û bi tilîya xwe ya şehedetê a destî rastê birek por veqetand û bi destê çepê girt. Wê bi destî rastê porê ku mayî wê de kir, bi ser omiza Şarê ya rastê da berda.

Wê pore ku dest da mayî carek din şe kir û paşê ew kire sê tela û dest pê hunanê kir. Wexta ku gihêste nîvi, wê benê guliya yê sur heyna û ew di horta guli ra derbaskir. Bi bêñ guli bi hev va têñ girêdanê, sewa ku guli birbelav newin. Morîyekê çava, kinirkek, penezekî zîvînî û zêrekî piçûk bi bêñ da kiriwûn.

Zêwê ji hêlekê da guli dihunan, ji hêlekê da jî şîret li Şarê dikirin, digo:

- Keçîka min, tu êdî ne hur ï. Salê te panzdeh ne û tu ê bi dergîst ï. Payîzê dohla te wê biwe. Ma te hay ji xwe hewe. Dost hene dujmin hene, xêrxwaz hene hesûd hene.

Oxira mîra mebire. Ji ber mezina rawe ser xwe. Vi xorta ra melîze. Berve mîra mekene, li ba wana rûye xwe çexke. Ku te vi mîra ra dengkir, serî xwe têke ber xwe û destî xwe bide ber devî xwe.

Zêwê porê Sarê giştik huna, kire guli. Wê seriyê guliya, ji jêr da berjor şê lêxist, gjivij kir, ku guli venerşen. Paşê wê guli hêjmîrin û go:

Vê carê jî bîst guli jê derketin.

Wê serê xwe tenkî paşva kişand, ji dûr va li gulyê keçîka xwe mîskir. Di kenê rûyê wê ra beli wû, ku ew bi hûnera xwe qayîl e.

- Xelas bû! De rawe keça min, ava me ya vexwarinê tune. Here ji kanîyê

avê wûne. Ez ê ku tenki herime nav mala.

Gûlî bi qeyda sênexkî têن hunan. Sênex navê benekî ye. Ew ji sê telayêñ rîs tê hunanê. Her sê telayêñ rîs ji serîkî da bi hev va girêdidin. Wî serî bi pêçîya nig yan jî bi niçikekî va girêdidin. Paşê, di ber girê da, bi her du destâ bi telayêñ rîs digrin. Ji axza rastê da, telayêñ rîs yê rastê diavêñ ser yê hortê. Yê hortê vê carê derbasê axza rastê tewe, yê rastê jî dikeve hortê. Paşê telayêñ rîs ê axzê çepê diavêñ ser yê hortê. Yê hortê di bin ra derbase axzê çepê tewe. Yê çepê vê carê di hortê da dimê. Bi vî tonî bêñ tê hunan û tewe sênex.

Mala Miçoyê Homê li gundekî li axza Haymanê, li derdawê Çiyayê Qerecdaxê wû. Gundekî piçûk, ji sed malî wû. Ew di kortê da wû. Lowma jê ra digotin, gundi kortê.

Pozê biharê û ro ji nîvro dagerî wû. Di ser gund ra, ezmanekî sayî hewû. Heyamî germ wû. Kal û pîrê gund xwe dawûn berojan. Li ser dev û rûyêñ wana ken û kêfê vi ber biharê ketine hewû. Yêñ ciwan diketin rû yêñ kal, digotin, hun îsal jî xelasbûn û vi ber biharê ketin. Êdi mirinî ji we ra tune.

Mîna ku goti, biharê xun bi têreke da dihat. Li ber dîwarê goma malê Miçoyê Homê manga û nugun dawestîwûn. Mangekê xwe bi kevirê koşê xêni dixurand. Du nuguna hev du dialastin. Mîna ku wana hev du bi zimêñ sisik dikirin. Îza zimanê wana li ser germê wana deq bi deq xay dikir.

Mala Miçoyê Homê û ya birayê wî, Hesen li jêr gund, li rû hev wûn. Wê royê li mala Miço tu kes tunewû. Ber

malê xewlê wû. Cucikêñ malê li ser kulingê, xwelî vedidan, li yêm digerîyan.

Di jêr malan ra, li ser çeyîr û çîman birek xort giheştiwûn hev û dikirin hay û bêri. Li wê derê, kuçikek bi dêlekê da deliqî wû. Xorta dor li wana hewşkiriwûn, bi kevira berdidan wana û dixwastin ku wana ji hev vejetînin. Lê kuçik û dêl ji hev nedîwûn, ew mîna ku bi hev du da nûskî wûn. Ziman di devê wana da dirêj bûwûn. Wana dikire hele hel û bi çav tirsî li dor û paş xwe mësdikirin.

Şekiro ji xorta vejetî û berva mal teçû. Mala bavê wî, li paş mala Miçoyê Homê wû. Rîya wî di ber mala Miço ra derbasdiwû.

Şekiro xortekî şîrin, şor xweş û bi ken wû. Lowma hemsalîyê wî navê wî Şekiro lêkiriwûn. Wî serhevdeyêñ qebila û malan gîstik dizanîn. Navê wiyê esil, Oso wû. Ew bi bavpîrê xwe hatîwû navkirin. Bavpîrê wî li herba Çelenqelê şehîd ketiwû.

Şekiro û Şarê hemsal û cîranê hev wûn. Wexta ku ew hîn piçûk wûn, bi hev ra dilîstin. Lê jîkî ku Şar bi dergîst e, ew ji hev dûr diherin.

Şarê çatiya avê di dest da, ji kaniyê av dikşand. Wê fistanekî heftreng li xwe kiriwû û kefiyeke gulpembe dawû serê xwe.

Jîkî ku ew bi dergîst e, wê iş û karê malê yên giran jî tikirin. Yêñ derdorê bi çêra wê bûn. Şarê mîna qeda pez didot, nan lêdixist û kinc dişûştin. Wî zemanî keçik û bûk bi van karana dipsandin.

Wexta ku Şar nêzke mal bû, dî ku Şekiro ji jêr da tê. Wê çatîya avê diyna

û li oxira Şekiro dawestî. Şekiro hat gihêste herda Şarê û dawestî. Ew di ber Şarê ra derbas newû. Wî dil hewû ku çend gili û gotina vi Şarê re bike. Wexta ku gihêste ba Şarê, wî hema dest pê şorê kir, go:

- Şarê, tu dizanî, yekî ji xalanê te cir kiriye?

Şarê serî kire ber xwe, go:

- Ci dizanim, cir kiriye!

- Wî di zemanê xwe da, bi hêştira ji Helewê şekir dianîye û difrotîye. Rokê, wî şekir li hêştira barkiriye û bi rê da rêwîyek rastê hatiye. Baraneke şen dibariye. Rêwî gotiye:

- Mero, barê heştirê te ci ye? Wî gotiye:

- Şekir e. Rêwî gotiye:

- Malavao, ne şekirê şil biwe, bihele û biçilke.

Xalê te keniye, gotiye:

- Taw ho, tu ci dizanî. Şekir ku şil bû, wê her çû giran biwe û kîloya bikute, ez ê jê zêde kér bikim.

Şarê dest da ber dêv û go:

- Tu serhevda dikî. Xalanê min veng nakin, ew hesawa dizanin. Lê, wê xwe bi zorê digirt, ku nekene. Wê dixwast ku here, lê Şekiro di ber wê ra derbasnediwû. Wî neterikand, serhevdayek din jî da ser:

- Ji bavanê te jî, yekî, mîrê malê li çolê, li ber pêz wûye. Gur hatiye pêz. Wî ji tirsâ ra bange kûçik kiriye û ew bi xwe va girêdaye. Gur pez qirkiriye...

Hin Şekiro, şora xwe teva nekiriwû, Şarê hiq û hiq keniya. Wê xwe negirt; çiqas xwast ku nekene, lê kenê xwe zeptnekir. Wê ji bîr kir ku destê xwe bide ber devê xwe û di ber

xwe da go, "towbe towbe, xêr e inşellah". Li gora edetê wîngê ïna dikirin ku yek pir kenîya, tiştekî neçê wê were sêri. Lowma towbe dikirin.

Kenê Şarê nesekinî. Ew devvekirî dikenîya. Didanê wê wekî sedef dibirqîn. Pesîrê wê hîn nû belbûn, wexta ku ew dikenîya geh heldihatîn geh dêdihatîn. Kefiya wê ya gulpembe ji serî da ber ve paş şemîti. Binguhêne wê yê gewr û kal xaykirin. Suyê wê yê dirêj, mina suşeyê çîra gazê, sisik û sıpî dikir.

Şekiro mat bû, di şûna xwe da nedilivî, mîna ku bi herdê va nûsikîwû. Li navberkê çavên wana li devhev ketin. Bi nîrînan mîna ku ew bi hev va hatin girêdan. Germiyek bi nav dil û cana da belavbû.

Bi qirinîyekê va her du jî vecinîqîn. Wana dengê dergîstê Şarê, Şemo naskir û bi lez û bez ji hev veqetîn û her yekî da rîya xwe.

Şemo di goma pêz da wû û binê pêz pakdikir. Wî di teqê ra li Şarê û Şekiro sêrdikir.

Şemo yekî hesûd, çavteng û dilçurug wû. Wexta ku wî şarê bi Şekiro va bi hev ra dîn, ew pê ragerî. Ew di şûna xwe da rep û hişk dawestiwû. Benz û bed lê qetîya, mîna xizik bû, ku te kér lêxista xun jê nedîçû. Çav di seri da gewr dikirin. Peçêkê şûnda, mîna ku yekî derzi tê ra kiriwû, qîrîni vi ser wî ket.

Wê royê, evarê Şemo vi diya xwe ra go:

- Etê, ez vi Şarê ra nazewicim. Xewerê hema bişînin, ma nişanê vegeşînin.

Dîya wî go:

- Wîy wîy, wêy wêy li min e, mala  
min şewitî. Xêr e, lawê min cir bûye !

Wê ji hêlkê de jî bi kuta li sîngê  
xwe dixist.

Şemo deng da, go:

- Şarê vê ar û nemûs e. Ku min  
bikujin jî, ez vi wê ra nazewicim!

Wê şevê, çira mala Hesenê Homê  
heta siwê venemirî. Mezinê malbatê  
gihêştiwûn hev û ketiwûn nav mitala û  
mineqasân.

Çend ro ketin navberê, xewereke  
neçê li nav gund belavbû. Gotin,  
Şekiro vi Şarê ra ye. Hevalê Şemo,  
Cino va xewera belavkiriwû. Cino ji  
Şemo hesudtir wû. Digotin, Ew ji  
hesudîyê vi dizan ra bûye heval û mala  
bavê dervakiriye.

Lekeya namûsê li ser Şarê ma.  
Mala apê nişana xwe xwastin. Sê  
malbat û mermaliyên wana li hev sûva  
hatin. Navê Şarê neçebû, bi ser da wê  
kut jî xwarin. Mala Miçoyê Homê,  
mîna ku bi yas wû. Rûyê wana nedigirt  
ku herin nav malan.

Payîz wû. Miço çû gundekî Tirkan,  
mala nasikê xwe. Nasikê wî, jina xwe  
miriwû, ew ji xwe û ji sêwîyê xwe ra li  
jinekê digerîya. Miço meri kirin  
navberê û Şar teklife wî kir. Wana şor  
dane hev du. Çend ro şûn da, meriyê  
nasê Miço hatin, ku Şarê pêwin.

Li gora edetê hîngê, Kurmancêñ  
van derana di nav xwe da dizewicîn. Vi  
merlixiyê ra zewicîn edet wû.  
Dewlemenda poz li hewa digerandin  
û kirîyê xwe nedikirin, ku vi xizanan  
ra bizewicin. Ji derva û ji yada  
zewicîn bi eyb digirtin. Li zewaca vi

gewenda û cîngana va bi çavekî pir  
neçê mësdikirin.

Va edetana li ba gûndê cîran yên  
Tirk, Teter û Çerkez jî hewûn. Ew jî,  
her yek di nav xwe da dizewicîn.

Tenê Kesê neçar û li herdê mayî ji  
derva dizewcin. Keçik û jinê ku lekeya  
nemûsê avêtiwûn ser, didane derva,  
ew yad dikirin; mîna ku bi vê rê ceza  
didane wana. Ji yên ku bi vê rê  
zewicîn ra digotin, "gune ye, dan  
yada".

Siwekê, vê dohl û vê dawet Şar  
kirin bûk, li erebeke hespa sîwarkirin  
û berve gundê Tirka vi rê xistin.

Li gora edetê, şareke sûr avêtiwûn  
ser seriye Şarê. Wê ber xwe nedidî. Du  
jin ketiwûn pîyê wê, ew berve erebê  
dibirin, mina ku bêyî, du cendirma  
yekî hêşîr dibirin.

Xeyrî malêñ ku sûvahatî, însanê  
gund giştik li ber mala Miçoyê Homê  
civiyawû. Hen hatiwûn xêrê, hen jî  
hatiwûn sérê. Mêr li hêlekê, jin li  
hêlekê din kombûwûn.

Ji hêla jina da, dengê girî û nalînê  
dihat. Dohla Şarê búwû şîn. Wexta ku  
ereba bûkê vi rê ket, dengê şînê bilind  
bû.

Dîya Şarê, Zêwa Hecî kilam  
distran, li sîngê xwe dixist û biskê xwe  
diruçikandin.

Wê distra, digo:

*Sala îsal, demsal har e  
Ar û nemûs barekî bi qahr e  
Hesuda ken li Şarê herimandin  
Welle, kérê lêxin xûn jê nahere.....*

# DIYA MIN Û MIRINA BAVÊ MIN

Musa Anter

**D**i salên dibistana sereta de, bîranîneke min ya bi êşa mirina bavê min e. Bavê min pûç (fêlc) bûbû. Di tatila xwe ya pêşin de, çaxa ez hatim mal, min bavê xwe nedît. Min li wî pirsî, lê jî min vedişartin. Ji min re gotin ku çûye ser textor. Dûra ji Hatxê metika bavê min hate Zivingê. Bi hatina xwe re dest bi giri kir. Wê gavê min fêmkir ku bavê min wefat kirîye. Di cih de ez çûm goristanê û min xwe avêt ser gora wî (min axa wê maç kir). Ez hîna jî bi êşa wê rojê dijîm.

Di 1963an de, dema ez hatim girtin, ew hê neçûbû rehmetê. Heta roja dawiyê, wî xwestibû min bibîne. Berî ku serê xwe deyne, çend caran "KA NEHAT, KA NEHAT" gotîye. Bi hatina min ya Gund re, daxwaza diya min bi cih hatibû.

Îca min dikarîbû, ne tenê bi cenderman re, lê bi mudîrê nehyê, qaymaqam û yuzbaşî re jî biaxiftima û me hevudû bidîta. Her wiha tahsildaran, memûrên daristanê û bekçîyan hesab jî min dikirin. Min çend caran, xwes-

tina xwe ya xwendina dibistana navîn, li ber guhê diya xwe xistibû. Diya min tofan radikir û bi ser min de hildibû: "Îca ci ye, tu mezin bûyî û tu tirkî ji fer bûyî, ez ê bi vê pîrekiya xwe çawa gund birêve bibim (îdare bikim).

Bi hesreta dibistanê meh derbas-dibûn. Ez ne şas bim, dawiya meha tebaxê bû, diya min ez û rîncberê me jî bo pêwistiyêñ çandinîyê em şandibûn bajarê Mêrdînê. Ez li hespê siwar bûbûm û xulamê me jî li qantirê.

Ber bi êvarê, em gihiştin Mêrdînê. Ji Qehwa Bilind ya li ser Kolana Mezin dengek hat: "Mûsa, Mûsa" û bang min kir. Ez rawestiyam. Yê bang min dikir mufetişê me yê dibistana seretayê, Sebrî Begê bi xwe bû. Ji bilî biserketina min ya dersan, jî ber hoyek din ya taybet kêfa Sebrî Begê ji min re dihat. Ew ji Gemlikê bû. Ji wir bi navê Eli merivekî xwe anîbû, ew kiribû xedemê dibistana me. Eli bi jin û lawê xwe di odayeke dibistanê de diman. Wî jî lawê xwe gelekî hez dikir. Di wexta xwe ya vala de gelek caran min lawik digirt û ew digerand. Rojekê

cardin dersa me tunebû, ez çûm nik lawik. Lê ez ci bibînim! Lawik û diya xwe di himbeza hev de ketî, li erdê vezilyayî ne. Min fêmkir ku tiştek hatiye serê wan. Loma jî min kir qîrîn û hewar. Mamoste û karmend bi wan ve hatin, doşek û lihêfên wan li derive raxistin û ew li ser wan dirêjkirin. Ew ji dumana komira menqelê bê heş ketibûn. Heger ez negihiştibûma ser wan, ew ê bimirana. Loma jî li dibistanê şahîyek çêkirin û mîna qehremanekî gelek pesnê min dan, diyarî û geşt dane min. Sebrî Begê, bi minetarı hertim ji min re digot: "kurê min yê melek".

Di cih de, ez ji hespê xwe peya bûm û çûm destêni Sebrî Begê. Wî got: "Wey lawê min girêdana te çiqasî sipehî ye" û pêre ji min pirsî, çima ez dibistanê nadominîm. Min jê re got ku derfet û imkanen min tunene. Sebrî Begê ji min re got: "Ez ê alîkariya te bikim" û pir tembih kir, da ku ez roja din biçime dibistana Gazipaşayê. Serê sibehê zûka ez çûm mektebê. Sebrî Beg li bendî min bû. Wî mudîrê Maarîfê dît û jê re wiha got: "Mudîr Beg, ev lawik îsal ci li dibistana me û ci ji, li yên din ên Mêrdînê xwendavanê herî bi serketî ye. Heger hûn rê bidin bila bikeve imtihanê, em ê ewraqêñ wî piştre dagirin. Çawa be diplom û nasnama wî li nik me ne." Mudîr qebûl kir û Sebrî Begê ez sererast birim odeya imtihanê. Tesaduf bû an ji şansê min bû, ez nizanim lê wê rojê ji imtihanâ "leyli mecanî" yanî xwendina belaş hebû. Di cih de qelem, jêbir û kaxizên imtihanê dane min. Pişti imtihanê Sebrî Beg carek din tembih li min kir, ku ez roja din rêya

xwe bi dibistanê bixim. Min jî bi ya wî kir. Dema Sebrî Beg li kaxizên min temaşe dikir û destê xwe di ser serê min re bir, min zanîbû ku ez bi ser ketime. Bêyi ku ez têbigihêm, bê ci bûbû ci nebûbû, em vegeriyan gund.

Ez xortekî 14 salî bûm. Diya min dixwest ji min re jinê bîne. Lê belê hesreta min ya xwendinê, dibû hoyâ ku ez hertim li dijî vê yekê derkevîm. Wexta vebûna dibistanan nêzîk dibû, ez di cihê xwe de nedisekinîm. Meh derbas dibûn. Rojekê diya min ji Nisêbînê kirîna pariyek "helawa koz" tembih kiribû. Rojnameyek li helawê pêçayî bû. Da ku ez bixwînim min rojname vekir. Pir baş tê bîra min ew rojnama "Hakîmîyetî Millîye" ku dûra navê wê kirin "Ulus", bû. Di rûpelê nîvî de listeyeke dûr û dirêj weşandibûn. Li serê listeyê wiha nivisibûn: "Kesên di imtihanâ leyli mecanî ya lîse û dibistana navîn de bi ser ketine." Liste li gora bajaran, bi dû hev de bi rêzê danîbûn. Min li ya Mêrdînê nêrî. Navê yekemîn "Şex-Mûsê lawê Anter", yanî navê min bi xwe bû. Ji rojnameyê xuyabû ku min xwendina li "Adana Erkek Lisesi" bi dest xistibû. Min dît ku du meh di ser rojnameyê re derbasbûne, lê min nizanîbû bê çima tu agahdarî nedabûne min. Min ji xwe re digot, min mafê xwe yê xwendinê winda kir û ez bêhtir dijejerîm.

Mudîrê Nehyê di nav min û xwe de çend caran digot: "Tu çima naxwînî?" Rojname di dest min de, çav li rê ez çûm nik mudîrê nahyê û min rojname nîşanî wî da. Ew li ber dilê min geriya û ji min re "xemê nexwe ez ê ji bo te tişnan bikim", got. Min lê vegerand û

got: "Xalê Mudîr, heger tu bi karê min rabî jî, diya min nahêle." Wî bersiva min wiha da: "Tu ji min re bihêle, ez ê çareyekê bibînim". Di cîh de bangî du cenderme û bekçîyan kir, emir da wan; "Herin Fesla Xatûn bînin vir."

Di heyecanekê de çavêن min li rê, ez li bendî diya xwe mam. Roja din, min dît diya min li hespê swar, xemgîn ji wir ve tê. Xemgînî û xofa diya min ji ber wê bûyerê bû: Di sala 1926an de, ji ber pirsa erdan, di navbera lawê apê bavê min Birahîm, xwedîyê Xerabkortê û xwedîyê Çûva, birê Hiso de, şer derketibû. Di vî şerî de Birê, du pismamên wî, mudîrê nahye Ahmed Beg û du cenderme hatibûne kuştin. Îca ci cara ku cenderme yan jî kesekî nenas bihatina gund, diya min ez û birayêن min Hesen û Usiv di şikeftê de vedîşartin.

Ez û diya xwe, em bi hev re çûn odaya mudir. Ji ber ku mudir ji Diyarbekirê bû, bi kurdî ji diya min re got: "Xwişka min, tu dizanî min hertim tu û zarokên te li himber hukûmetê parastine. Lê, vê carê emir ji Enqerê ye" û kaxizên li ser masê şanî wê dan û domand: "Ev giştik ewraqêن we ne. Emir wiha ye, ya wê Fesla Xatûn Şêxo bişîne dibistanê yan jî hemûya nefî bikin û ji me re bişînin." Wek şanogerekî bi wî karî rabû û diya min razî kir. Diya min bi girî; "ci karê min ji hedîseya Birahîmê Mehmûd ya li Sûriyê ketiye. Ez jinek bî me. Zarokên min sêwî ne. Ma ne guneh e? Enqera ji min ci dixwaze?" gazin kirin. Lê, girî û gazinêن diya min fêde nekirin. Mudir li ber geriya û dawî diya min qebulkir, da ku ez herim dibistanê. Kêfa mudir

pir ji vê bîryarê re hat. Di cîh de bi telefonê li Mêrdînê geriya, lê bi dest nexist. Di encama çend hewldanan de, bi îstegeha trênen re pêwendî pêkanî. Li gor bersivê, roja din trêna Edenê dê hebûya.

Em vege riyan gund, ci bû û ci nebû diya min ji gundiyan re got. Te digot qey sinekê gund girtibû. Neheq jî nebûn. Ji ber ku kêsên heta wê rojê ji gund hatibû şandin, careke din paşve venegerîya bû. Diya min dilşikestî hazirîyêن min kirin. Roja din, dilşewitî porê xwe kişand, li ruwê xwe xist û ez bi rê kirim.

Diya min, keça Hisênenê Sarê ye. Hisênenê Sarê serokek ji yê eşîra Binyatkî bû. Wê eşîra kurd ya Êzîdî (Yezdanê Ruhanî) di dema dawî de musulmanî qebûl kiribû.

Diya min li Kaniya Şêx a Qurdîsê hatiye dinê. Avakirina gund ji aliyê kalkê min ve, bi xwe jî balkêş e. Ew ji eşîra dijber keşa serokê eşirê direvîne. Bapîrê pîrka min, Birîm Axa, hingî zâlim û otorîter bû, xelkê jê re digotin: "Xwedîyê Çalê", yanî xwedîyê gundê ku ew lê rûdinişt. Ci malbata kalkê min û ci jî malbata pîrka min be, fermana pîrik û kalkê min didin. Kalkê min jî radibe li panavê quesrekê avadike. Bersiva herdû malbatan dide. Ji reha xwe ya kevn, ji êzîdiyan, "Keleşen Kurdish", komekê dighîne ser hev. Ji çar gundêن li dora xwe rez û bexçêن nêzîk, bi darê zorê dikire û Kaniya Şêx ava dike.

Îca, diya min li warek wiha mezin bûye. Eger em bala xwe bidinê ji kalkê min re "Hisênenê Sarê" dihate gotin. Ne bi bavê xwe Mahmûd lê bi diya xwe Sarê dihate naskirin. Di nava

kurdan de jinê çeleng, qahreman pir in. Her çiqasî lawên wan gelekî jêhatî bûn û dikaribûn di dirokê de cîh bigirtana jî lê ew bi navê diyê xwe bi nav û deng bûn. Wek nimûne kalkê min “Hisênenê Sarê”, serokê eşîra Reman “Emînenê Perîxanê”, serokê eşîra Omeriyan “Mihemedê Şemsê” û hwd...

Rojekê diya min ji min re wiha got: “Lawo, her çiqasî bavê te Anter di xortanya xwe de mir jî, wa xuya ye xelkê bêhtir qedir dane wî. Loma ji te re nabêjin “Musayê Fesla”, lê “Musayê Anter” dibêjin. Lê belê lawê min, ez ji vê yekê aciz nabim. Ez ji bavê te hezdkim û hurmeta min jê re heye. Bi rastî jî min ew derbas nekir.”

Di ciwanbûna xwe de xwîn ket ser mejîyê bavê min Anter û ew pûç (felic) bû. Diya min 7 salan, mîna zarokeke pêçekê li wî nerî. Birayê min ê biçûk Ûsiv Anter di dema vê nexweşiyê de hatiye dinyê.

Di vê navê re Komar Turkiyê saz bû. Kambaxiyêن bi serê herêma me de hatibûn, min li jor, ji we re diyar kiribûn. Ji bili gundê me, bi 25 gundan ve eşîra Temikan bi ser Sûriyê ve hatin berdan. Hemû ciwanêن Zivingê jî koçî Bin Xetê (Sûriyê) kiribûn. Ji muxtariya gund re zilamek tenê jî nemabû. Diya min, ji ber ku Silêmanê Temo ji vir û jî wir çend gotinêن bi tirkî zanîbûye, wî bi pera dike muxtarê gund. Silêmanê Temo di şerê cihanê yê yekemîn de besdar bibû û merovek bi temen bû. Salekê piştre ew dimire û jî mecbûrî diya min dibe muxtarê Zivingê.

Min bavê xwe li ser piya nedît. Min di bîranînêن zaroktiya xwe de jî

nivîsibû. Min hertim diya xwe dît. Carnan ji min vê pirsê dikin; ”Te nasnameya xwe ya politîk û edebî ya îro ji kuderê standîye?” Ez bê şik dikarim bêjîm, min ji diya xwe girtiye. Wê hergav ev tembih li min dikir: ”Lawo, tu carî li bextêñ tirkan û ereban ewle mebe.” Her wiha, hertim merxasî, camêrî û dilovaniya bi xelkê xwe re dianî bîra min. Ez vê helwesta diya xwe dişibînim nesîheta Salih Begê ku li lawê xwe dikir. Ew li Kurdistanê begê dawî yê mîrîtiya Şîrvan bû. Ji wî re “Ahraz” (kerr) dihate gotin. Dîroka Kurdistanê û dîwanek jî nivîsî ye. Salih Beg di helbesteke xwe de, ji lawê xwe re dibêje:

“*Salih digot kurê xwe  
Emanet e, feqîr e  
Pêşî dest bi ilm bike  
Paşê bike nêçîrvaniyê  
Geft û xebata xwe bike  
Ne wek bav û bapîran*”

Li vir Salih Beg dixwaze bêje, ”me şâşî kir, tu ne wek me, lê ji berjewen-diya xelkê xwe re kar bike.”

Ne ji ber ku diya min e, lê ji ber li Rojhilata Navîn jinek nexwende ya kurd e, ez pesna wê didim. Ji ber ku ez jinê din ên kurd, ji nêzik ve nasnakim, min navêن wan nedaye. Yan na, jinê kurd yê mîna gorêñ leşkerêñ nenas, bêhejmar in. Va ji we re, mîna du nimûneyan; yek Leyla Qasim û ya din jî Zekiye Alkan e.

Vergera kurdî:  
Seyîdxan Anter

## XWELÎ BI SERÊ MIN

Dîcle û Ferat ez im  
Sîngê min qelaştin  
Diherikin bi lez û bezin  
xwelî bi serê min  
Nizanin ji bo çi  
Berve kê dibezin

Sîpan û Şengal ez im  
Ser zinarên wan  
Karxezal û kewa binaz im  
Xwelî bi serê min  
Mij û dûman  
Nêçîrvan jî ez im

Şivan û bêrîvan ez im  
Dû berx û karan  
Zozan bi zozan dibeşim  
Xwelî bi serê min  
Gur û diz  
bîzbenda qetî jî ez im

Pêşmerge û tifing ez im  
Şervan im azadî dixwazim  
Li qada çarçira li dar dilerizim  
Xwelî bi serê min  
Sépêdar û ben  
Cellad jî ez im

Mem Xelikan

## NARIN

Ez ji Swêd da çûm bi teyarê  
Sibê Zû da li ber malê  
Min dît ku Narîna min  
Li ser çardaxê nehate xwarê

Oy Narînê oy Narînê  
Min bi te ra nekir gilikî xwe i şérînî  
Heya destê diya min pê nebe  
Ez venakim bawola xwe i darînî

Oy cîrano mala me li kêleka rê ye  
Narînê go lawo tu li ku mayî  
Çavêن min li rê ye  
Ji ber êşa dil xew min nayê

Te mala xwe ji min re hişt û bakir  
Jiyana min ya xerîbî yê  
Tev li hev kir û sar kir  
Ez nizanim te çîma li min weha kir

Felekê jî min re derxistiye ferman  
Keko bide pasaporta diya min  
Ezê bigrim herim welatê ewropê  
Jê re bibînim derman

1998/06/16

## BÊMAL

Li çole sar  
Li erde rut  
Birbanga bê zar  
Sibê ya ustu xar

Ez ci bikim merxase  
Be yar û be ar  
Te jiyana xwe  
Dayi riya lal

M. Kızılkaya

# ÇARİN JI HÊLÊ SARIZÊ-2

Berhevkar:  
Mehmet Bayrak

Li vê êlê li wê êlê  
Teşî ristiye têl bi têlê  
Destî min di destî xwe ke  
Tu gu mede şorê êlê

Lo lawiko tu ji ku tê  
Ji ber koynê ber bisu(sî) tê  
Tu gu mede êlê govcî  
Kî dezanî ku heval li su tê

Li vî sarsî li wî sarsî  
Lawiko were tu metirsî  
Tu ekî çiqayî zâlim bû  
Rokê te li min nepirsî

Li vî sarsî li wî sarsî  
Keçik tu ê ke çiqa tersî  
Keçik were li rev min rûne  
Çoma tu ji min detirsî

Li ber derî li ber derî  
Kofiya surê le sar sarî  
Ma şora xwe daye hava  
Ji bîr meke hata serî

Çiyê ma çiyane pirr bulundin  
Li gundî me dudîye rindin  
Hûn bi hevra cîranyedakin  
Ji rindan ekê ba mindin

Tu masakin la sar wî xonî  
Bibêje bulxur û donî  
Wara ku te carke paç kim (maç kim)  
Merkî kofî ci di zanî

Rêyê Adanayê dûza  
Tomafilaqn viza viza  
Kaçik wara la rawmin runa  
Tu e ka çiqa haqsiza

Dilo dilo dil dandika  
Dasmal şandîye tawarika (taberîk)  
Azê ku desmale çirkim  
Dardê dilimin lawika

Çave rsaşîn çav belake  
Rabim runim li keleke  
Lawko te çima min war kir  
Li taxî tirê falake

La (li) ve hêle la wê hêle  
Por şe kiriye têl be têle  
Destî xwe di destî min ke  
K'em herine êl be êle

Çavê te wek çavê kûzan  
Çiye bi fendin çiyê bi dûzan  
Bi roye şor daye min e  
Bi şev got: "bavo rawe dizan"

Mere mere lawik mere  
Çî sivikî weke para  
Ku daykê min ez neda me te  
Tu were li ber bigere

Lo şivano lo şivano  
Ustu rakir kirye kuvano  
Wa şora xwe kiribiye ek  
Hara li hevalê xwe biwe nivano

## Varyant 2

La nav şivan la nav şivan  
Ustu hiulan kira kuvan  
We şora xwe kirîye ek  
Hera la havalê xwe bibe nivan

Aw ci iş bû av ci iş bû  
Baran barî tîş be tîş bû  
Gotin nazkiya te reviye  
Bande ilimin qotmîş bû

La ber derî la ber derî  
Êîta heft rengê la serî  
Silavak ja minra şandiye  
La sar çavan la sar serî

Tu daymaka tu daymaka  
Hara nazliyê min ba rê ka  
Desmale ja min ra bişîn  
Bi ra ja min ra biminî tabarika

La hambara la hambara  
Awê nazlîyê çoqa sara  
La ber bavî xwe bigara  
K'am ba tavo herne dara

Dilo dilo dil dandiko  
Nane xwanadanan katite zik a  
Azî ki nanî mixanaton cir kimdaedê  
dilî min zaynik a

La ve tope la we tope  
Kaçık garî ba xop xope  
Pirr silavan ji min lê kin  
La bilmez e keçikê ape

Nav xweş navi ta Zaynik a  
E ortê male naynik e  
Ki ci dawê bira biwe  
dardê dilî min Zaynik e

Ka la qarşîye tu la qarşîye  
K'am ba tava herne çarşîye  
Ma şora xwe dawîye hav  
La sarî rê la ortê çarşîye

Baran barî tov ba tova  
Keskû sur xwe avitîye nava  
Min rinda xwe la hamber dî  
Berve min te gav ba gava

Hawal mara ba xwe rêda  
Azê nuxwaşa da ardê da  
Tu la ser min bakav wara  
Halê ku nazliyê ta têda

Rindê rindê rinda Zerî  
Ta ez gerandim derbaderi  
Porê seri min sis kir kira heri  
Bi ra rindiyê te la kuri Binboxe  
bexeri

Dilê min kata mayrekî  
Bancê zirav simêl zara  
Çave bavî min birijin  
Girtin dame fiqarekî

Malê Zeriye la ber gazî  
Tede di şewiti fenare qaze  
Ta ez k'al kirim mal şavitiyê  
Mira meke cilve naze

Çavkani: Zeynep Bayrak

Tu la qarşkiye ka la qarşkiye  
Wara k am harina çarşkiye  
Me şorê xwe dawîya hev  
La sari re ortê çarşkiye

La ve tape la we tape  
Keçik geri ba xapxape  
Pir silaven min da lêka  
La we bilmeze kaçkê ape

Bancaka zirave lê ya  
Şivaka şebabe lê ya  
Ki ci dawe bira biwê  
Zati dilê minî lê ya

Navi te be mi ci xweşê  
La seri çiteke reş e  
Lawo tu çav la min meke  
Zati tu kerekî başa

La Trabzon e la Trabzon e  
Xocayi dixwini erzone (ezane)  
Xoca e ki çıqayı puştâ  
Nekirin ku lê bivina nivone

Keçik navi te ci rinde  
Mala xwe la ortê gunde  
Min rinda xwe la qaqrşkiye di  
Qonaxa xwe çiye bilinda

Baran bari tav ba tava  
Kesk u sur xwe avitiye nava  
Dawata ke le gund heye  
Gotin rinda te ye la nava

Axa axa zalim axa  
Qara çali kirina baxa  
Va çutulu êlê sone  
Yâr girtin kirina yasaxe

Kaçık mara ja xwe weda  
Bancê zirav teri pê da  
Dasti xwe da dasti min ka  
k am harina ba navi di da

K am ba teva tak duduna  
Em kulilka navi di na  
K am ja rindan nazawcina  
Ja kotiyon k ame razina

Hada hada kaçık hada  
Teşi de dest da gulok bada  
Gulokê ja desti xwe dine  
K am harin ba malê ma da

Em ba tava çifteki rindin  
Male ma la yani gundin  
Tu beri xwe berva min meke  
Ezê datirsim ji dedigodyê gundan

Çave girin çav heşin e  
Pezi bavê xwe i meşin e  
Tu pezi bavi xwle lebex e  
Parayı bavê mini pêşin e

Navxweş navi te Eli ye  
E ki dibari toli ye  
Deri bigir were içi (hendur)  
Xweli la seri Eli ye

Poti seri têl be têle  
K em bigarin êl be êle  
Keçik aksiliye meke  
K em ramadin la otêl e

Virda wêda virda wêda  
Nazli hat ja qarşiyê di da  
Silavek nedaye mina  
I teriye ba nav di da

Navi rindê min ci xwaşê  
La sirt fistoneki reş e  
Gotin rindê te yas girtye  
Em dinin la seri çitê reşe

Weda weda keçik weda  
Pişt gireda şirrik pê da  
Keçik dilê min kata te  
Tu megere virda wêda

Gavê min la bancê te ket  
Avr gurmujin baran dakat  
Min go singê xwe va ser  
singê min da  
Daka te hema la baket

Suratê xwe çıqa surun  
Nazliya min hilgirtin birin  
Hûn nazliyê min kuda dawin  
K ez va dasti we bigirim

Lawik mere je xwa wêda  
Runişt la bin deri sî da  
Bang kir got tu were rev min  
K em runin la bin siye da

Lê kiçikê lê keçik ê  
Çiçik gir bûn bûna kuçuk ê  
Ku te ser singê xwe venekir  
La taxi tîrê feleke

Were rev min k ez bibinim  
K ez hevali xwe bişinim  
Şorê min û xwe be ekke  
K ez dungurçiyê te bişinim

Lê keçikê lê keçikê  
K ez dawestim la kalake  
Desti xwe de desti min ka  
Em be tuşti nagirin feleke

Meke meke rindê meke  
Deri vêke cih min bika  
Min silav ja rinde ra şand  
Winin da kalakê min ka

La ber deri la ber deri  
Perçem şekir şapqa la seri  
Biwên ba şapqayı xwe dini  
K ez bibinim perçemê seri

Meke meke keçik meke  
Wîrda wara tu war meke  
Aze ba şev warima  
Deri veke min da içika

Wêda wêda heval wêda  
I nuxweşi da arde da  
K ez herim hevali xwe pirskim  
K ez bibem ku derdê teda kuda

Mala xweyê la paş diyara  
De nigda potina sura  
La qarşıye xwe la bamaka  
Were desti min bigira

Em be teva eke ekin  
La içi gund eme tekin  
Bavi teyi min naxwazi  
Biwê bavo tu wermeke

Dostê minê ja ave te  
Sontil da dest da bervê min te  
Tu mesekin la ortê re  
Bavê teyi je jêrda te

Dilê min la ta tunini  
Weda here meke dini  
Zati ez te hilnagirim  
Be ser mida mewe xwini

K em aşixin k em aşixin  
Be rindê xwe va barişixin  
Hûn qarşı rindê min mawin  
Zati eme berişixin

Ez çîrbikim ez çîrbikim  
Ne qîçika k ez gir bikim  
Hûn dilê nazliyê min bikin  
K em herin rahle gendi bikin

Lo lawiko ni ja gundo  
Bencê dirêj çîqa rindo  
Seri xwe raka da min mezke  
Çi kibiri poz bilindo

Ev çi işe ev çi işe  
Erd qalîşi tîş be tîşse  
Gotin nazliye xwe ê la deriye  
Hazir kir kebab û şîşe

Dili min û te dudune  
Kom vegirtye ê la bine  
Tu çîma la mi lasuket  
Tu e ka çiqasta dina

Aman aman nazlî aman  
Kaçkê vi gundi çîqa yaman  
Goin nazliye te yle qarşıye  
K ez bervê herim bibem (qurban)

Kilam ja kilaman rindtirin  
Qaş ja bruyan bilinttirin  
Hûn qatç rindê xwe mekin  
Gulê min ja gulan babintirin

Kilamê dil çîqa xweşin  
Çav û buru hina reşin  
Tim qalê min û xwe bike  
Sevdalina içi reşin  
Kilamê dil bibê fedî meke  
Hesê min û xwe be ekke  
Ki çidabe bira bibê  
Dengi min û xwe sarmeke

Çavkanî:  
Zeynep Bayrak

Berî derî me baxçeye  
Wî baxçeyi çîçek daye  
Se ro se şevan K'ada içi da bimînim  
Ê li na wê ku, daka min mirîye  
maye

Ez e ka serbestim  
La derî Ê li dadewastim  
Roke nawe (Nabe) ku Allê  
Allê wara içî ku,  
ka çayeke we(be) dest dim

Çiya me çiyake girin  
Etege xwe ba kevirin  
Daykê lavikon teriye  
Li derîye xelke demirin

Çavkanî:  
Nazli Aksu (105 Salı)

# Bi dergîstîbûna Guldil

Yusuf Yeşilöz

Guldil lawikê jina Mixtêrê duwemin bû, jina wî ya siftê, li ber bêriyê, rojê li serî xistibû û çûbû rehmetê. Qet ku tunebûn, panzdeh zarokên Mixtar Selo, ji du jinan hebûn. Umrê lawê wî Guldil li dora bîst salan bû û ew xortekî bi dest û pê bû. Bejna wi ya dirêj, simbelên wî yên pan, çavên wi yên reş li dorâlî bi deng û nam bûn. Li wê biharê ew bi dergistî kiribûn. Ji bo ku dergistiya wî keça mixtarê gundekî bû, tiştek ku qîmeta wê bilind dikir, güstirkên wan ji serrafê bajarê Enqere hatibûn şandin.

Guldil li kêleka Gola Xwê li ber pêz bû, wexta ku xebera dergistibûnê ji aliye pismamê wî Bilo, li ser kera boz, jê re hat, li wî cih Guldil beranekî çê serjêkir û goşt bi Bilo ve tevhev li şivanên doralî belav kirin. Paşê, çend roja bi şûnda Guldil ji hevalên xwe re gotibû; "Wexta ku min bîhist ku ez bi keçika mixtarê Kolitan re bi dergistî bûme, min ji qulaxakî (girav) li kêleka gola xwê bazda ser qulaxakî." Şerbeta Guldil vexwarîbûn, çend roja jê re şenayî kirin bi dahol û zirnê, heta ji gundên kurdên li nêzikî Enquerê xort hatibûn û rêz bi rêz govend kişandibûn. Dawet hevqes bi nam bûye ku li serê dinî dinyayê xebera millet jê bûye. Ji xwîna pezên ku hatibûn serjêkirin, li ber mala Selo çem hatibûn çêkirin, çalên risini tiji bulgur(savar), biroşen baxir tiji xoşaşa çîra hatibûn kelandin. Şerbet, çay û

çeçilmast mîna ava kaniyê hatibû belav kirin. Heta ji Îneviyê jî qeymaqamê serkeçel, bi jina xwe ya virek va hatibûn û heta ku koran hatibû xwendin, li mala Selo runıştibûn.

Selo hesab û kitebên xwe kiribûn û dixwast daweta Guldil wê peyîzê bike. Haziriya xwe giştik kiribûn. Lê wek tê gotin, roj herdem nayê der, pîlana Selo kete avê. Ew çawa bû, ez ji we re bêjim: Li gundê Selo mizgeft (camî) tunebû. Ji bo wê yekê ev gund herdem ji ali herkesi ve dihat rexnekirin. Li her idê gundiyyêن Selo diçûn Tuzlayê û nimêja xwe ya beyramê li mizgefta vir dikirin. Li wê idê Selo xwastiye bi tene bi lawikê xwe yî ku nû bi dergistî kirî û bi motorê xwe yî ku wê salê şandibû biçe mizgeftê. Ew herdu tiş, lawikê dergistî û motorê Fordson, hingê ne hindik bûn. Selo kiribû serê xwe, wan herdû tiştan bi xelk û elemê nişan bide. Wekî din ji wî bi xwe nedikarî motorê bajo, çûyina Guldil yek ji bo wê bû. Di nav toz û dûman de ew gihiştin Tuzlayê, motora xwe, di bin çavê meraqlî de, li ber mizgeftê cihiştin û ketin hewşa mizgeftê ku mîran lê abdest dikirin. Guldil di jiyanâ xwe de qet hundirê mizgeftê nedîtibû û nedizanî abdestê heyna û nimêj bike. Hin mîra jê pirsin, ka çîma Guldil abdestê heynane, lê heta ku Guldil bi xwe bersivekê bide, bavê wî got ku Guldil iro sibê zû li mal abdesta xwe heynaye ji vê vir de ew neçûye ber

destan. Wek Selo ji wî re gotibû, Guldil di mizgeftê de li paş wî rûniş, rabû ser xwe, wexta ku Selo rabû û rûniş, wexta ku Selo rûniş, koran ji bê deng di hundirê xwe de xwand, lê ya rastî, di hundirê xwe de kire pistê pist. Kes lê neçû ferqiyê ku Guldil, roniya çavê Selo, nimêj û abdest nedizanî...

